Zozan

Helbest
Dîwana duyemîn

Tîrêj

Birrê Evînî

TAVA XIZÊMÊ

çawa ezê te'j bîr bikim
eşqa te har û dîn kirim
bi soz û bawerya berê
b'cerda giran û leşkerê
nakim jibîr sebra dila
sîng meshefa şêx û mela
pozê çilagî mermere
mîna dilopek `enbere
dêm k'ebeye xal ew bere
xal pût û latê Azere
ey olperestê dîl û jar
naghêje armancê tu car
xizmet nekî tu'b roj û şev
fermo ji meydanê birev
yê ku nebî yarek bedew
hovê çiyaye bê derew
rûniştinek nêv dîlbera
nadim bi melyonê pera
nadim bi Bexda û Ferat

ey çîçeka ber vî dilî
derdên te dan ser vî kulî
terka te nakim koçerê
Zor Temir başayê Milî
çavên direş kanya kila
ezber dikim vî rûpelî
tava xizêmê da sere
xala li dêmê sorgulî
dêm tore lê xal agire
xal Laleşê nîva gelî
xizmet nekî bi kar û bar
sofî bi dev nabî welî
bawer nekî bi dil û dev
bê gazin û lewm û gilî
çi fêm dikî j'dinya xwe ew
lê be hezar ax û xwelî
camek ji destê esmera
nadim bi zêrê surmelî
nadim bi milkê Rojhilat

nadim bi zozan û xelat çimek ji neynûka tilî
ey xanima birc û seran ser deftera dêm gewheran
vê emr û fermana giran êdî ji ser Tîrêj hilî.

JÎN TEV JAN Û HALE

nêzîka te yarê bi min wek xewn û xeyale
dûrbûn ji te gewrê bi min wek zindan û çale
rojê carekê ez bejn û bala te nebînim
see't bi min roje lê belê roj bi mi sale
xwezya ku te zanîba bi êş û elemê dil
tê behwer biba bê te çiqa jîn bi mi tale
wer carek biçin havîngeha gelyê Elî beg
wek baxê buhişte tev gul û çîçek û lale
kêlîkê di gel hev em li ber maseyê rûnên
meya ku li ser tev ji rez û tiryê Şemale
şerbik tije ava belekê berfê ye cana
lê maze ji êmîşê Metîn û Çemçemale
da caman li hev din ji meya taze binoşin
sermiyanê evîndar bi xwe cam û peyale
dîwane bibin şoxê xwe windakin ji derdan
ev jîna ku ez têde li min tev jan û hale
çibkim feleka malikxerab herdem bi kîne
togê ez dikim nakim bi mi'r nabî hevale
ger ku ez timî wa bim ezê çibkim bi jînê
Tîrêjê reben êdî bese ma ev çi hale.

RENG Û NÎŞAN

Sawêra keç ji ber çavê mi naçe
Heya sax bim tucar ne'b roj û ne'b şev
Bi zaravê minin ev reng û nîşan
Heya bimrim ku çavê'm bidne ser hev
Hero carek ku ez dîlber nebînim
Elest û serxweşim bê pirs û bersev
Eger meyxur heroj carek nenoşim
Meyê roj lê dibî tarî û bandev
Evîndarî divê herdem wisa be
Ku dildarî ne wabe jê bi dûr kev
Evîn û jîn yekin bê hevdû nabin
Bi rastî ne'b lef û dewran û ne'b rev
Divê herdem li hale hev bipirsin
Heroj carek ku ew rûnin li cem hev
Li rengê bilbila herdû binalin
Birêjin hêstirê xwînê digel hev
Dema ku bighêjin warê evînê
Li wan jîn xweş dibî wek şîr û hingev
Divê her kes hebe wî dost û yarek
Di qanûna evînê de bese ev
Eger bê yar be tê çi'bkî ji jînê
Bimir zûka di gorîne de rakev
Bi dilkî baqijî şi'rê bixwîne
Tu kêla tu li Tîrêjî ne bişkev.

PINCARÊ BEHARA

Şoxê de rabe ser xwe bigherin cih û wara
Çiyayê Kurdistanê cihê me dost û yara
Bela bête dilê min xweşî û şademanî
Pir xweşe geşt û seyran li zozanê Hekara
Emê ji xwe'r ava kin xanîkî ser du maxan
Li gundê Serçenarkê li navbera du tara
Bi kunc û hem seferne bi cîcerk û bixêrîk
Rêzkin li ber kulînê qafûr û çend kewara
Emê qîma xwe bînin bi nanê garis û dew
Bi meyir û bi nîskê bi danxav û savara
Bi tolik û qinêber kumik û dobelanê
Kereng û sersipîkê bi pincarê behara
Emê herin nêçîra beytik û çikçikana
Li gelî û newala li şikeft û mexara
Emê ji xwe'r bibrêjin goştê teyr û tilûra
Li ser agrê di qurma li ber lat û zinara
Emê li ber xwe deynin du sê nanê tenûrê
Ewî goştê biraştî li bin dara hinara
Bixun bi şademanî firavîna xwe yarê
Evê gera xwe yî xweş jibîr nakin tu cara
Tîrêj temen te tev çû bi va xem û xeyala
Ranabe dil bi lava ji va xew û temara

DIGERIYAM EZ LI DERMANA

Mi çar goşê dine tev da giham ber perê ezmana
Ji bo eşq û evîna dil digeryam ez li dermana
Dipirsî min ji şalûran ji baz û bilbil û çûkan
Ji dehl û çîmen û devyan ji bax û mêrg û bistana
Dipirsî min ji beybûnan ji tuxmê çîçek û sorgul
Ji xunça nêrgiz û lalan ji sosin û ji reyhanan
Dipirsî min ji rûbarê ji kanî û çem û ava
Ji xabûr û ferat û şet ji mij û da û dûmana
Mi pirsî j' gumgumê tava ji wan ewrên di reş tarî
Ji wan birq û birûsk û ba ji berfa û ji barana
Dipirsî min ji wan derya ji pêl û bager û mewca
Ji wan hûtê binê behra ji elmas û ji mircana
Dipirsî min ji kortala ji bîrê bê binî bê av
Ji wan teht û şikeftên reş ji ar û pêt û birkana
Dipirsî min ji pehnava ji sirt û çol û berpala
Ji wan gelya û zinara ji koh û deşt û zozana
Dipirsî min ji şênaya behar û germa havîna
Ji wexma payîza tev jan ji serma wan zivistana
Dipirsî mi'j teb û hovan ji keftar û gur û hirçan
Ji ferzîn û rex û fîla piling û şêrê sîpana
Dipirsî min ji Farqînê ji şehrê Ameda rengîn
Ji şop û kavilên Dara cihê Mîdya û Mîtana
Dipisî min ji cotkara ji gavan û şivanên pez
Ji qîzê'l qurmik û qirşa ji rêwî û ji karwana
Mi pirsî j'xortê geryayî ji wan kalên zemana tev

Ji bê mal û belengaza ji wan jar û perîşana
Dipirsî min ji yê'd bîrwer ji wêjan û nivîsaran
Ji xwenda û ji mamosta ji hoşîmend û hozana
Cîhan pêkve mi teva da lê kesî bersiv nedabû min
Ji bêçarî û bêhêvî berî min daye ezmana
Pêlek bayê qerecdaxê ji nîşkave li min rabû
Bi bala hilfirandim ez ketim nav çerx û dewrana
Ji birca Behremê hatim dipirsî mi'j gelawêjê
Dipirsî min ji perwînê ji roj û hîv û mîzana
Ji ba termê Merîxê çûm mi şopa kadiza tev da
Ji istêra sipehrî çûm berî min daye keywana
Ji wan her neh sitêrên leq di çerxa asîmanî da
Mi pirsî bû belê negham tu armanc û tu ramana
Polî poşman û bê hêvî ji bala ez vegerya bûm
Piçek derman nekir peyda li erda û li ezmana
Ewê çaxê mi xweş zanî ji bil giştê nehin derman
Bese Tîrêj rehet rûne bikêşî sebr û samana

BÊ KAR Û BARO DILO

Keçkê gundê me çarin tew lo dilo lo dilo
Bi berbisk û guharin jar û binbaro dilo
Keçkê gundê me şeşin tew lo dilo lo dilo
Gewr û boz û çavreşin bê kar û baro dilo
Keçkê gundê me sîne tew lo dilo lo dilo
Bi toq û gerdenîne dîl û xembaro dilo
Keçkê me rêçenasin tew lo dilo lo dilo
Bi îşlek û kirasin wey dîn û haro dilo
Keçkê me xwendevanin tew lo dilo lo dilo
Çeleng û mehrevanin bê cih û waro dilo
Keçkê gundê me rindin tew lo dilo lo dilo
Nazdar û serbilindin bê pişk û paro dilo
Keçkê me 'b xeml û xêzin tew lo dilo lo dilo
Xob û bejn dirêjin ey şermîsaro dilo
Keçkê me şox û şengin tew lo dilo lo dilo
Bi nav û pir bi dengin Tîrêj bê çaro dilo

Kemer zîva

Ji min bê made şahzadê dikim nakim mi naxêva
dilê min xweş nekir carek bi çend pirs û bi çend peyva
Ku temtêl û ayîna wê li ber çavê mi sawêrin
Digel min ew dixwî ,vedxwî firavîn û ewan şîva
Zirav îro dirêim ez çiqa dinya bi min tale
Di tatûla enî rojê li min nînin xewê şêva
Eger carek mijûl bin pev ewe lav û ûmêda min
Ewê têhna mi bişkînî şeraba wan dev û lêva
Ezê têr bim bi dîdarê bi wê bejnê bi wê balê
Bi wan çavên di reş dêmên di sor birwên wekî hîva
Li wê deşta evînê xewş bixemlî wê behara dil
Bikin em geşt û seyranê di nav baxê gul û sêva
Ji biskan mûyekî nadim bi milk û malê dinyayê
Bi Şêrîn û Xec û Zînan bi sed qîz û kemerzîva
Bela wêga mirin heq bî nebî hesret di gorê de
Ji Tîrêjî mekin lewma mi kes navê ji wê pêva

LEBTA DIL

Jana evînê wa ji dil avête nav penc û reha
îro di wa kuncên di reş bûm xesteyê sal û meha
textor li ser min pir civîn derman mixabin lê nehat
sed derzî û toz û hebik ji toxmê erzan û beha
şaş mane ew textor hemî tev keten tatûla giran
pêkve hemî çûn dil bi kul poşman û tev gerden zuha
hemyan ji ser min dane rê bê hêvî û çar û ûmîd
çare di vê êşê nedîn beyhûde wan yek ji deha
textorekî zana û jîr ew hate ser min bê guman
ez wergerandim rast û çeb lepta dilêm da ber guha
nêrî li min û ser hejand go kawiko derman eve
sêvên xelat û mişmişên bajarê Çermûk û Ruha
kûpek ji wê ava Zinar mistek ji berfa Serheda
çend lib ji bîhokên Melat hirmên ji darên ber giha
derhûdê saxbûna te me tê xweş be dîsa wek berê
jana dila êşa te ye parêzke xwe j'van guneha
Tîrêj bizan derman eve guh mede peyv û gotina
vana tu çend rojan bixwî nîro êvarê sibeha

BEXTÊ ME LI XWARE

Gewra minê behare, çol xweşe wek buhuştê
Xeml û xêza xwe girêde da biçin kêf û geştê
Qadê kiraskî heft reng waye l' bejna xwe danî
Ji zozan û sîpanan wa mirxo têne deştê
Bi zaravê xwe bilbil , hawayê dil dibêjî
Bêhna gul û beybûna wa li nêv baxan xweş tê
Bayê siba dermane xweş dikî derd û êşan
Avê çema xumxume wa bi leylan û meş tê
Çiya û deşt û zozan tev dikin rohnî gulşen
Rojê vaye l' me da- der lê gewrê j' hêla reş tê
Zendan li hev bipêçin lê berî mirnê carek
Şens û bextê me l'xware , ger sed bî yê me şeş tê
Eybê me tim belû ne yên dildaran veşirtî
Daxwaza me pir dûre lê yê wana l'teniştê
Diravê xelkê zêrin lê gewrê yê me paxir
Wekî Tîrêj dibêjî tu hilîn têx ber pişтê

ÇALA SERMEDÎ

Geryam di nav baxên gulan
Min yek gula sor tê nedî
Jaro belengazo dilo
J'bextê te reştir min nedî
Westim ji hindamê ketim
Gêr bûm li ser xakî zemîn
Dîl û perîşan û reben
Rengê ciwanê Amedî
Teyr û tilûrên dev çema
Murxên di nav bax û rezan
Hatin li dor min bûn xelek
Îro li min bûne xwedî
Wan bilbilan û totiyan
Hatin di gel min nalîyan
Hay min nema bê hiş ketim
Wek Mem di çala sermedî
Ew hêvî û çar û ûmîd
Bûne li min xewn û xeyal
Baweriya min qet nema
Ji dîna gul yek ji sedî
Soz bî li min êdî ji bin
Ez naçme baxê wa gulan
Qet nabime kolê dila
Bê şermîsar û bê fedî
Tiştê me kir çû ber telef

Destê min û erd ma'b tenê
J'Tîrêj mekin gazindeyan
Ji ber ku mi'd xewna xwe dî

FERAT Û DICLE

Hela carek bi şîn kev tu ey baxê dilê min
Bibişkivin ji xaran binefş û sorgulê min
Ku li deşta dil û can bibî benga beharê
Ta ku têde bixwînî şalûr û bilbilê min
Ku li derya evînê bibî mûran û bager
Pêl xwe bidin ser pêlan Ferat û Dicleyê min
Li kenar û delavan di nêv baxên gulîzar
Bikin seyran û geştî nejad û ew gelê min
Sê par ji vê jîna min çûn bi xem û xeyala
hêz û hemet neman qet di pêgav û milê min
berî mirna malxerab mi'l darbestê dirêjkî
xweşî bête dil û can bi derkevin kulê min
çend helbest û dîrokan ji bo millet bihêlin
heta ku pê mijûl bin civet û komelê min
ew hêvî û ûmîda Tîrêje her şev û roj
çêtir ji zêr û gewher ew xêzên rûpelê min

AVIM ÇIKA

Min dî di baxê sorgulan
Bilbil didî ber çendika
Vêra dikî qîr û hewar
Zozo dibarî rondika
Min gote bo çî bilbilo
Wek min bi fîxan û girî
Yara te wa hember teye
Lê ma gelo yara mi ka
Baxê te wa tev bişkivî
Pêkve gulên sor û zerin
Têde bikî geşt û firê
Gula di himbêza xweka
Vaye li te bûye behar
Îro dem û dewra teye
Xwezyam bi te ey bilbilo
Derdê dilê xwe xweş bika
Carek li halêm nanerî
Ey bilbilê şadî eman
Wa sorgulêm tev çilmisîn
Wa kaniya avim çika
Kar û xebata min hemi
Îro li min beyhûde çûn
Hilî mi çand virnî ketî
Pa ez çikim piştim şika
Tîrêj gelek heyf û xebîn

Keda te ma j'xelkê re lo
Avêt mi rast lê çep ketî
J'mezrîbê çûm ber şirika

KELEHA BERTEWÎL

Zîz bû li min şeva reş kanî soza te yarê
Ew civanê te da min li bin dara hinarê
Rûniştin em digel hev gilî gazin me pev kir
Xox û hirmê dixwarin li ber siya êvarê
Ta ku tu bête nêk min tena kirasê mexmel
Mudêla kin li çogê bê çarik û xomarê
Destên xwe em bidin hev herin ji van welatan
Herin çiyayê Torê topraxa wê zinarê
Bikin seyran û geştê li bajar û li gundan
Şehrê Bedlîs û Wanê gundê Kefer hewarê
Li gelî û zinaran li nêv bustan û baxan
Tirî bixun ji mêwan sêvan ji gulyê darê
Bela tim bê guhê me dengê bibil û çûka
Li nêv baxê gulîzar li deştê û zinarê
Herin bi serfirazî cihê bav û bapîra
Paytextê Mîtanî -- şehr û bajarê Darê
Ji xwe'r carek bibînin wan şop û kavil û wara
Wê keleha Bertewîl şikeft û wê mixarê
Dara bi nav û bi deng qehreman û cihangîr
Qeralê heft welatan li jorê hem li xwarê
Newroz û cejna teye ey Tîrêjê dil bi kul
Wê sorgula dilê te bibişkivî ji xwarê

AZANA MELÊ

Rojek ji rojên Tîrmehê
Da min civanek çavkilî
Çavê mi bûn steyrik li rê
Kengî li min wê roj hilê
Hindî li bendî mame ez
Hilyan li min ew cerg û bez
Paşê mi dî yar hat bi lez
Min go çima wer maye lê
Bersev neda min eşkere
Hat min bi remz û awira
Tirsa'm ji ber bav û bira
Tirsa'm ji peyv û belbelê
Zû derketin b'lez û beza
Em çûne nêv dehl û reza
Em hatine hevdû b'geza
Li ber dîwarê kokelê
Sura bayê gelya l'me tê
Em ketin warê fersetê
Mirin di bîra kê j'me tê
Bilbil di pêsîra gulê
Em çûne ser tehtek repin
Çavîke av der tê ji bin
Ji hêla himbêzê mezin
Min dest dirêj kir baxilê
Ew paxila bişkoj li ber

Du sêv mi jê anîne der
Mi'b wan dilîstî zo û fer
Geh min didan ber bêvilê
Mêtin rewa mi'd wan nehişt
pêta dil û can pê mi kuşt
Dunya li min bûye buhişt
Wê d'gote çi mi'd go belê
Hirmê tirî xox û hinar
Me j'wan rez û dehla dixwar
Ta roj Li me çû ber bi xwar
Heta bi azana melê
Em herdû têr bûne ji hev
Dîsa vegeryan mal bi rev
Dosta evîndaraye şev
Ku pêşiyan gotne welê
Çerxa felek ey dûm kinê
Derd û kul û qehra dine
Sê par te dan Tîrêj tenê
Hawar ji vê zilma te lê

PALEYA PÛŞE

Ma gelo nayê te bîrê , ku te dildarek hebû
Her wekî reswa û kola, tim li dergahê te bû
Her dema ku te nedîba roj dibû lê wek tenî
Xan û eywan tim li wî zindan û hebs û çale bû

Xortekî naz û çeleng bû, ew di nav nifşê xwe de
Lê ku ket tora te şoxê , kalekî sed sale bû
Pişte xûz û rih sipî bû herdû ling lê bûne sê
Ten b'lerz û dest bi kopal jar û bê pergale bû

Berya dil bigrî xwedanê cotê sê ga bû timî
Ew bi qînax û bi das, her dem bi xwe ser pale bû
Dexl û dan û zad ji ber îro hemî xelkê çinîn
Paleya pûşe ku wî da pey te pûç û vale bû

Te di nîvê rê de hişt carek te lê ho veneda
Jîn li wî bûye kerafî wek zirav û tale bû
Yê bidî pey te timî poşmane her ev tê serî
Ji tiyêd eşqê re leylane ne av û ale bû

Ey Tîrêjê dil bi kul wey rêwiyê rahê xelat
Te çi qotîne bi dû de her dema bê çare bû
Ew ji ola xwe venabî sûnd bi Tawûsê Melek
Di evîna te de wek Êzîdiya Şingale bû

NARÎN

Ey narîn narîn narîn
Zeriyê rû girover
Tilyê zerî zeytûnî
Gustil zêrê qaş mermer
Zend û bendên badayî
Gerden bi mor û mircan
Sîn wek berfa zinara
Sîka dara girtî ser
Memik wek du hinaran
Di paxilê hildane
Meyxoşe ez dimêjim
Her digvêşim av tê der
Enya gewra mi came
Xwe têda ez dibînim
Zelal û pir bi şewqe
Wek neynika Eskender
Herdû çavê teyî reş
Tijî kilê sibhanî
Pozê teyî çilagî
Ser daye hewdê kewser
Çiqa pesnê te bêjim
Tu'b kêsim û fesale
Rewşen dikî bejna te
Xemla kesk û sor û zer
Tu' b wê bejn û temtêlê

Dakev reqs û govendê
Li hawê saz û nayê
Tu'l meydanê her û wer
Xort û lawan serxweş ke
Bê kas û cam û bade
Şêx û mele stû radin
Li ber lingê te dîlber
Da em xwezya xwe bînin
Bi vê newroz û cejnê
Bankin miryê di gora
rabin roja me da der
bi yezdanê dilovan
her se'etek vê rojê
nadim bi taca Kesra
nadim bi textê Qeyser
bawer be xweş tu Tîrêj
van xêzên rûpelên te
xortên meyî dilovan
bixwînin wê ji ezber

GOZELÊ

Keçikê roja te xweş
Goriya çavên di reş
Bi tenha wer tu bi meş
Gozelê

Bedewê dunya deme
Salek el benda teme
Aşiqê bejna teme
Gozelê

Porê tey reş temezî
Gulî û bisk û kezî
Dil ji xortan didizî
Gozelê

Çi mi go tu'l mi megir
Fermo carek were vir
Serê govendê bigir
Gozelê

Çi dîlana çê bibî
Ne xweşe tu tê nebî
Li dunê tim tû hebî

Gozelê

Reqs û govend û sema
Kêf û xweşya me hema
Ji te pêve kes nema
Gozelê

Birevîn derd û kula
Evîn û eşqa dila
Li Tîrêj bûne bela
Gozelê

BIRC Û EYWAN

Yar eger bête semayê bi tena
Ji meşa werdek û zaxan çi divê?
Ger tu ramûse ewan dêmên di sor
Ji gul û çîçekên baxan çi divê?
Ger bimêje herdû lêvên qurmizî
Ji kulîlkên serê şaxan çi divê?
Ger tu û yar herdû hev çengel bikin
Ji gulîsorê di taxan çi divê?
Birc û eywan ku cih û ware te bin
Te ji mircaq û ji maxan çi divê?
Ger bi torê neçî rava masiyan
Ji delav û ji qeraxan çi divê?
Ger ne derwêş bî li duryan û riya
Te ji keşkûl û ji caxan çi divê?
Ger nebe bênder di nîva bênderan
Te ji wan sap û diraxan çi divê?
Ger di dil rehm û dilovanî nebin
Te ji wan term û kelaxan çi divê?
Kuştiyên te ger li meydanê nebin
Te ji wan miry û nesaxan çi divê?
Ger nebe alîkarê şoreşgera
Te ji mîr û beg û axan çi divê?
Rengê Tîrêj neb êşa millet re bî
Te ji derd û kul û daxan çi divê?

EVÎNÎ SOSRETE

hate hundir ew ji nişka ve,li min çog lerizîn
Ji piyan ketme bi carek dest û pê tev tevizîn
Rist û berbisk û guhar û gerdenî xemla giran
Lê dixun tu d bê ji malbat û nejadê Hurmizên

Wek Memê hundir û der bûne li min baxê di mîr
Cejn û newroza mine ku bê civan hatiye zîn
Em ketin warê evînê bê hiş û sewda di mam
Wek Beko gundî û cîran li min û yar qelizîn

Bes li dunyayê ji mer 'işq û evînî sosrete
Pêjn û sawêrek ji kû bê em ji tirsa d qevizîn
Bi gilî û gazinan derdê xwe mej hev re digot
Dil li me bûye birîn hestî bi xwe tev derizîn

Ew birîn û dax û derz û derd û kovanên di dil
Bûne wek çavî û cokan, tev bi xûnê çirizîn
Paxil û pêsîr vekir yar paşê destûra me da
Dest û tilyên me li ser gerden û sîngê leyizîn

Hate fermana gelê Ermen ji Dergahê bilind
Ê ku ew berbat kirin Tirk bûn ne Kurd û Çerkezîn
Herdû destan du êrîş berdane himbêzê mezin
Min ji baxê dîlberê îro du sêvê sor gezîn

Dêm û çav û rû bi carek ketne ber maç û gezan
Ku li ber lingan kum û kolos û kofî pengizîn
Ewrekî reş girte ser xakî cîhan ro berze bû
Bisk û cênîk ku li ser rûkê sipî da berizîn

Min li ser sing û berê taze bi şeşrengê dilîst
Hil û mircan bûn berik pêkve ji ta tev beyizîn
Daketin cengê rex û ferzîn û fîl û kerkedan
Keleha şah çû ji dest leşker ji meydanê bezîn

Bi meya denê evînê herdû em serxweş dibûn
Şerbeta işqê vexwarî min ji lêvê qurmizîn
Min di vê jîna xwede xweştir ji vê rojê nedî
Şabaş ev dana xwedê ye têde em vedgevizîn

Min ji bo nîşan ber û paxil hemî yoxilme kir
Kil û kildan şeh û neynik min ji bêrîkê dizîn.
Ey Tîrêjê dil bi kul bes rabe dîwar bi guhin
Mîr eger bêb ser me de em dê di çalêd birizîn

KEWA GOZEL

S:ji ber pacê xwe bid alî geroka gund û cîrana
bi min xwîna te pir talî te naxim şi'r û dîwana

K:ezim terha serê lemma kulîlka ber devê çema
dilopa hingiv û xurma li ser lêvên di hozana

S:gever gijê enî pirçê çepil xwarê lepê hirçê
ji rengê pîreboka çê Li dû rêwî û kerwana

K:sipî bozim gulî sorim bi bisk û xemrî û porim
xezala Cûdî û Torim sitêrim ez li ezmana

S:genîkê dev bi qerqêtê timî bêhna ne xweş jê tê
hekîmê Wan û Xarpêtê rehet nakin bi dermana

K:ezim navka qinê gwîza ezim rûnê devê hîza
ezim rinda keç û qîza gula nêv bax û bistana

S:çi tiştê tey bedew çavin timî sist û xil û xavin
bi şotik û şil û av in ne wek rengê tu îsana

K:E çav şînim diran zêrim ne seyda xortê bê kêrim
kevoka lat û zinêrim kewa gozel li zozana

S:diran belê devê bêrê tu bê xemlê tu bê xêrê

kezî b'rişkê bi qilêrê ne xurdê birc û eywana

K:tucar cavê xwe kil nadim tu xemla ez girê nadim
bi ser bejna xwe bernadim jibo çavê şoreşvana

S:bi hesretya dilê Kurda tu tev ramek xem û derda
emin bêkes li rû erda ji xêrxwaz û dilovana

K:bi Leyla û bi wê xûnê bi Dêrsim û bi Sasûnê
xwe naşom ez bi sabûnê ji bo girtyên di zindana

S:hela wer ez bi heyranim li ser çavê mi bê xanim
ji van peyvê xwe poşmanim delal û pertewa cana

K:bese tu dev ji min berde dilê min tev kul û derde
ku dilxwazê gelê Kurde bi tore xîj bikî qana

S:ezê tenbûrekê l'saz xim sere tilya li perda xim
vêra bêjim heya saxim li ser hale perîşana

K:bi dêrana Helebça me qijoka xakî Zêwa me
rebenka Kurdê cola me li ber serma zivistana

S:du laşin em bi yek canî nema têm te bi erzanî
Tîrêj darê xwe va danî di vê rê de yekin ana

PERÇÊ SEDEF

Delala ber dila Nermîn gulî sorê sipî zendê
Enî rojê birû hîvê te çav şînê şeker xwendê
Dev û lêvên te yî nazik ji rengê xunçeya sorgul
Ez im ew bibilê şadî te can û dil ji mi stendê
Keç û xort têne meydanê buhar û cejn û newroze
Çiqa îro dinêrim ez xuya nakî li govendê
Ji ber ku şahî û govend tu carî bê te xweş nabin
Were dîsa tu wê xemlê bidî ber misk û mawerdê
Bi wê bejna zirav carek bi pêlava bi kabik yar
Bi wê kofya hevirmêşî bi bînok û gulabendê
Tu dakev reqs û dîlanê bi te meydan bibî rewşen
Wekî şewqa gelawêjê bi şev ruhnî bidî erdê
Di dil min de nebî hesret ji ava zendeganî ez
Bimûçînim ji kanya dev ji nav lêvên te comerdê
Ku bendê qanûna Mizdik li ser dêman bixwînim ez
Nigar û neqşeyên Manî xuyakin ew ji pişt perdê
Ji ser sîng û berê taze ewê çarê tu bid alî
Li ser da ku bilîzim ez bi dam û kişik û nerdê
Memik wek cewherê taze ji nav perçê sedef derxim
Diyarî bid me pêşmergan li Hekarê û Derbendê
Çiqa pesnê te bêjim ez bi dev xamê timî kême
Li textê Kurd û Kurdistan şehînşah û xudawendê
Hinav û gurçikên Tîrêj li ser pêta evînê tev
Bi kevr û hesteyê pola wekî pîşo ji hev jendê

Perçê qeşê

Şevke bê perde û poşî hate nik min rûgeşê
Şev bixêrek daye min xistim ji hiş wê çav reşê
Şev civîna dilgira ye min ji kêfa jêre got
Ma gelo vêga ji meyxanê tu tê ey serxweşê
Da mi bersiv gote na hinga mi xweş bawer dikir
Rahiba dêr û kenîsan tê ji dîwana keşê
Herdû ebrû li mi hildan wek du heyva l' min hilhat
Yek ji hêla Mekehê ya dî ji hêla Laleşê
Leşkerê Hurmiz du êrîş dane ser xakî cîhan
Leşkerê zor Ahrîman revyan di tarîka reşê
Rohnî û tavê seraser daye çar goşê zemîn
Ez li ser çogan diçûm maç û tewafê neb meşê
Bend û hêsîr kirme wa sîng û bera zendên sipî
Ku li ber çav im diyarin her wekî perçê qeşê
Neyneka Eskenderê Romî ziyayê ser derî
Daye xwarê keleha Dara şikand wê şoreşê
Rengê Roksana li ber min maye bê nirx û giraw
Xeml û xêza rengereng lê bûn bela biskên di şê
Ew şeva şadî û xweş Tîrêj tu car nakî ji bîr
Can bi dest û yar li hember dengê nay û cembeşê.

Helbestên perwerî
û
xweş – xwan

Bazê çeleng

dewr û dem tev ya teye rabe ji xew kurdê leheng
dakeve meydanê îro her wekî şêr û pileng
ha j' xwe ke îro birader dem ji te derbas nebî
xweşî û rewşa cîhan wê l' te bibî tarî û teng
çerxê bîsta ye ji dest xwe bermede vê firsetê
tu li çar hawêr binêre kes nema bê şer û ceng
gelê Efrîqya hemî bûne xwedî al û keya
bûne azad ew ji destê Hebeş û zulma fereng
şoreşa Kastro li Kûba serbilind û qehreman
şoreşa li Nîkaragwa ya bi nav û pir bi deng
serfiraz bû ew ji destê Emêrka zor bi zor
kêr nekir bombên etom saroxên hok û pîreşeng
xweş tu behwer be tifinga ku di nav milê te de
hemberî hêza neyare ew firok û top û teng
bide ser şopa gelê pêşketî ew rêça dirust
zû tê bighê doz û armanca xwe ey bazê çeleng

tu bi bîr û behwerî dest bavê zincîra demê
toq ji gerden wê vedî ew qeyda zingarî ji ling
kurdê xayin ey bira paqij bike tu j' wan welat
davêjî paxla te dijmin wekî sersot û pereng
xan û hundir bike kavil tu bi ser wa'd hilweşîn
koka wan rake ji qurm mîna kelendor û kereng
koneye dijmin tucarî pê nexapî ey bira
geh bi olê geh bi zor tême bi sed hawa û reng
koremare ew bi sed derb û lêdanê namirî
ta ku ser neşkê mejî jê der nebî b'derba kuling
tu li hember weke şêr, rawest li hevrazê çiya
ala rengîn deyne ser mil bi def û awaz û çeng
bide ser piştê bi êrîş ey bira yefşê medê
dil bi tirse ew li meydanê xwe nagrî pêzeveng
tu welat ava bikî bi birc û qunaxên bilind
da bi şahî têde rûnin ew şepal û naz û şeng
bilbil û şalûr di baxan de bixwînin dem bi dem
da ji bala bê me dengê qêrîna qaz û quling
geşt û seyranê bikin ku em li mêrg û çîmenan
em ji bîr kin setemê bên der ji dil tîr û xedeng
tu li Tîrêj xweş bikî derd û xemê jana welat
bûye wek kalê zemana wa mejî girtiye zeng.

Xwe nespêrin neyara

Ev tevger û xebat û siyaset û guhertin
Di dunyayê de îro divê em jê nemînin
Ew qada çol û beyar bûye şûva du gîsin
Bela em tev li kar bin tovê xwe têd biçînin
Divê paqij be ew tov ji zîwan û xurêlê
Da em berê cotê xwe bikarin jê hilînin
Gelê bindest sersar teva serê xwe hilda
Serxwebûnê dixwazim wekî me dilbirînin
Eger em dest nebin xwe para me ye paşketin
Gelek dijware dijmin tu rûpela naxwînin
Bese em ha j xwe kin bes, xwe nespêrin neyara
Dek û dolaba her dem li serê med gerînin
Geh bi fen û bi xapan geh bi rîp û dewrana
Pişk û para me her gav ji destê med revînin
Binçengin lê ji hev re hemî piling û şêrin
Bi vî awayî dijmin ji hev me radqetînin
Tuxmê kewin ji hev re ribatê ser şikêra
Cengê ji hev dixwazin tim li hevdû bi kînin
Kurd em sî û pênc melyon dijîn li rojhilatê
Ji çar alî ve her yek serîkî j'xwe dikşînin
Birîn kûre lê derman yekîtiya me kurda
Birîn tucar nayê hev ku em derman neyînin
Binê dîwarê Berlîn Alman pê bû du preçe

Wa îro ew bi xurtî ji bin ve dadixînin
Ezerbêcan ji mêj ve ew jî bibû du perçe
Ewa rabûne ser xwe wî sînorî hiltînin
Sozmana Saykis Bîko li Kurdistan çend sînor
Danîn divê em rakin xwe j' bin destan derînin
Ev dem û dewra zêrîn bi ser me re derbas be
Di nav toz û dûmanê dîsa emê bimînin
Kerwanê dem bi rê ket eger ne pêre bin em
Belengaz û perîşan li şûnwara bimînin
Eger bi dilpaqijî destê xwe em bidin hev
Di meydanê de hêzê dijmin emê bişkînin
Pismamê qehremanên Aşûkan û abtîkan
Xan Dimdimê çengzêrîn paşayê Fareqînin
Can fidayê Sasûnê şêrê Zozan û Serhed
Ma ne şerm û fihête îro di vî zemanî
Bê al û text û serek ku em qîma xwe tînin
Ey Tîrêjo êdî bes kezeb li xwe te reş kir
Yan dewletek serbixwe yan qir bibin nemînin .

Lav lav bê fêdeye

Çavan ji tamarê veke kurd beske vê derd û xemê
Îro li şûnwara tu bes maye ji karwanê demê
Karwan bi dûrket rabe lo berya li te şevreş bibî
Hê tu li Tehtoşkê gurik karwan gihaye Dêrcemê
Ger ku li te şevreş bibî tucar tu naghê meqsedê
Tê dê bibî şîva gura tu dê herî b'derdê Memê
Xwestya te bi xemla giran dotmam keça apê te ye
L'hespê siware lê neyar girtî bi hefsar û gemê
Rabe wekî şêr û piling azad bike bûka çeleng
Wek Mîdî û Mîtaniyan bawer bike tu j' wê lemê
Ger zorî û xortî nebî lav lav bi xwe bê fêdeye
Nexta cîhanê himete xwîne diwêta qelemê
Bela tucar em şaş neçin tim şûr dewra xwe dilîze ew
Tim serbilindin xurtemêr yê qels dikêşî elemê
Bejna xwe ger xortên ciwan nedin ber rext û fîşekan
Ger yektî û xurtî nebî bi felsefê çibkin emê
Ta ku em dev bavêjne hev tim paşketin para me ye
Pêk nayê daxwaza me qet bi qûteqût û hêlemê
Tim gotina Tîrêj ewe êdî bese em ha j' xwe kin
Îro divê kar û xebat bêtir ji her çax û demê .

Şem'ê kafûr

Miletê jînê bixwazî bê ked û kar û xebat
Her wekî avê ji rewrewkê dixwazî ey bira
Şem'ê kafûr tê nebî zeyt ruhniyê nadî kesî
Kûp ku bê gaz û fitîl bî vala şewq nadî çira
Miletê ku hêz nedî xwe ew bi bala nekevî
Wê bimînî kêm û bindest ey di kunc û hundira
Miletê Rûsa eger xwîna xwe nerjanda tucar
Ne dibû serbest û aza ji rijêma Qeysera
Rengê Kûba yê welatê xwe bi xwe ava nekî
Wê timî kola bimînî bê şeh û al û sera
Ku bi sed ah û xwezî dest naçe ser baqê kezî
Ger ne wek şêrê çiya bî wê bibî şîva gura
Rastî û dilpaqijî milet pê dighê meqsedê
Miletê kurd rabe bik kar û xebatê ji xwe ra
Xweş bizane ku Xumeynî û Sedam û Êverîn
Kurdistanê nadine te ew kaniya zêrê zera
Ey gelê kurda xwîn birêjîn ev dem û dewra te ye
Dest hilanîn fereca xêrê ye bes a mi j'te ra
Hîn bibî 'ibret bigir êdî ji van xêzên me got
Çiku dilxwazê te ye ,Tîrêj bi rastî eşkera .

Çirkîna dirana

Ey kurd rabe ser xwe tu ji nav cih û nivînan
Ev çax û dema kare , bese xew li te şerme
Ro hatiye nîvro hê tu razaye xewaro
Tu bi jana ziravî yan di bin çermê te werme
Hayê te ji bayê felekê nîne hejaro
Çirkîna dirana tu bi taya sar û germe
Bavêje ji ser xwe tu eva cil û nivînan
Çavên xwe veke meyzeke dijmin girte ser me
Bajar û welat îro ewan tev kirne wêran
Darên dehl û bistanê me rakirne ji qurme
Xan û dexl û danê me hemî sotin bi agir
Palas û qir û qaf tev hilanîne ji ber me
Ev qada me ye lê çikin em bê cih û warin
Berf û baran li me tê tim sar û serme
Bese rabe xwe rapêçe di rextan de bi merdî
Wek Tîrêj dibêje ma ne bes ev lav û nerme .

Ala çermîn

Dixum sûndê bi Êlim heya hebî me Laleş
Naçim mizgeft û dêran berî nadim berê reş
Buhişta ku bi werd û bi sîwaka mi navê
Sed mereba bi dojê li nav wî agirê geş
Di nav caman de deynin li ber xwe latê Azer
Di gel Homan û Nemrûd li ser masê li bergeş
Cama welat li hev din di nîva agirê gûr
Xwe winda kin ji derdan bibin elest û serxweş
Qurtek ji camê nadim bi ava zendeganî
Digel sazbend û sazan dengê bilûr û cembeş
Natirsînî min agir ku têde serfiraz bim
Buhişta ku bi qelsî ew dojehe ew ateş
Tucarî ez xwe naxim rêza wan rih gemara
Bela ez bême sotin digel Beram û guhreş
Rûnim bi serfirazî li nêk box û berana
Kawa di nav me hilde ala çermîn bi derfeş
Jîna bi serfirazî xweştir ji baxê ridwan
Wekî Tîrêj dibêje hezar û neh sed û şeş.

Dayê mi berde

Dayê mi berde ezê herim şer
Bavê milê min tifing û şeşber
Têx ber pişta min kuling û xencer
Dayê mi berde ezê herim şer
Rextê tifingê bavêm ser mila
Ezê sînga xwe bidim ber gula
Li benda minin kozik û çeper
Dayê mi berde ezê herim şer
Emê rizgar kin cê kal û bava
Serxwebûna me nayê bi lava
Dijmin ji welat divê bikin der
Dayê mi berde ezê herim şer
Şer xweşe dayê cenga welate
Ev çax û dema kar û xebate
Bidin ser pişta dijminê xwînxwer
Dayê mi berde ezê herim şer
Ezê va herim şerê neyara
Bidin ber laşa çol û beyara
Ku bernedin wan kê wan bikî der
Dayê mi berde ezê herim şer
Ku bême kuştin dayê bilîlîn
Li ser gora min gula bibarîn
Ji tuxmê gulê kesk û sor û zer

Dayê mi berde ezê herim şer
Dengê arbêcê xweş tê guhê min
Va tev rabûne penc û rehê min
Şer û qewxeye îro li her der
Dayê mi berde ezê herim şer
Emê dest bavên qevdê tifinga
Emê biqorin wekî pilinga
Dijmin ji welat îro bikin der
Dayê mi berde ezê herim şer
Wekî Xalid û Yado û Ferhat
Canê xwe bikim bi gorî welat
Di laşêm vebin kulek û pencer
Dayê mi berde ezê herim şer
Welat bandikî wa min dixwazî
Xorto were şer bi serfirazî
Şeveq ji nîva reşê tête der
Dayê mi berde ezê herim şer
Tîrêj bandikî ji dil dinalî
Kurdno xwe medin îro tu alî
Buhişta welat hatiye ber der
Dayê mi berde ezê herim şer .

Vegerin Welat

Vegerin Welat Vegerin Welat
Xortên xwendevan peyên dîmoqrat
Hemû bibin yek komel û civat
Vegerin Welat Vegerin Welat
Welat bandikî wa we dixwazî
Kêrî we nayê ger û tolazî
Porên sor xelek çîmên di tazî
Vegerin Welat Vegerin Welat
Milet we hiştî di dest neyara
Tên wan bi qamçî bi qute dara
Gêrê b' wan dikin wekî dewara
Vegerin Welat Vegerin Welat
Kanî mêrên qenc heyf û mixabin
Welat we berda bi destê dijmin
Mane perîşan keç û kal û jin
Vegerin Welat Vegerin Welat
Rêberên welat bîrwer û xwenda
Vala nehêlin bajar û gunda
Li hev nekêşin qayîş û benda
Vegerin Welat Vegerin Welat
Çiqa bimînin hûn li devera
Li bircên belek li xan û sera
Welatê xelkê nabî ji wera

Vegerin Welat Vegerin Welat
Welat xweştire ji Çîn û Maçîn
Amed xweştire ji şehrê Berlîn
Ji Siwêd çêtirin Wan û Fareqîn
Vegerin Welat Vegerin Welat
Heger bi rastî miletperestin
Ma li vegerê çima hûn sistin
Ev sûc û guneh ji me tê xwestin
Vegerin Welat Vegerin Welat
Bavên milên xwe tifing û sê rext
Li benda wene çiya û şikeft
Derxin ji welat dijminê bêbext
Tîrêj bandikî Vegerin Welat.

Ne bê cî me

Ne serbest û ne aza me di zidanê de girtî me
Dem û dewran li min tengin di dunyayê de bêcî me
Di nêv xewn û xiyalan de diçin çola bej û xalî
Doşek qade mitêl ezman belê balgeh bi xwe hîme
Ji dûr leylan û rewerkan dibînim wek çem û avin
Bi ber wan ve rewanim ez ji ber ku ez gelek tîme
Di nîva wan gur û hirçan dijîm lê dest birakin em
Di wê çolê de winda me nizanim ez bi xwe kîme
Di xewna de gelek cara ku xwe d'bînim li zozana
Li jorê lat û zinaran li hevraz geh li banî me
Li min xweş tê sura bayê siba bêhna gul û sêva
Li warê bav û bapîran wekî şahê Mîtanî me
Li kurdistan xwedawendin bi kom û leşker û hêzim
Bi tac û şewket û alim li textê Aşokanî me
Ge xwe'd bînim wekî Dara li cîhan qehremanim ez
Li ser textê sedef zêrîn li Dara ez rûniştîme
Qeralê heft welatan tev li ber min bê çek û darin
Ji Sen'a û Yemen heta çemê Nîl ez gihiştîme
Ji paytextê Eskender heya 'erşê Nefertîtî
Bi bara bêş û salyan tên derê genca diyarî me
Ji eqlîmê Teter heta ku bingehê Babil û Aşor
Qiral û serwerê Hindê hemû zanin bê ez kîme
Belê çibkim dem û dewran li min geryane çep îro
Esîrê destê Eyranim firarê Tirk û Tazî me

Eva rabûme ko dergeh li zindanê bikim perçe
Bi gernasî xwe aza kim ji kok û qurmê arî me
Tucar xewna m bi cih nayê ku ez xwîna xwe nerjînim
Tîrêjê miletê kurdim ne bê warim û ne bê cîme

Ji ya xwe danakevim

Ez narevim narevim pêşmergim ez narevim
Wek hîm û tehtê çiya tucar ji cih nalivim
Bi zarotî diya min şîr daye min bi xwînê
Dunya li min bi yek bî ji ya xwe danakevim
Tim li neyar û dijmin rojê dikim şeva reş
Tukes mi naşkînî tucar ji hêz nakevim
Rûmete kuştin riya bapîr û kalê min e
Sindyanê dar berû me ez natewim naçivim
Kozk û şikeft û çeper birc û qunaxê'd minin
Xincer û rext û tifing bê wan ez ranakevim
Xeml û nîşanê minin ev şal û şapik û kum
Şevgêrê deşt û çiya Tîrêjê roj û şevim.

Durek nasifte

Welatê min timî şîne buhar û mêrg û naraze
Hemî av û çem û kanî çiya tim berf li hevraze
Kilîşek pir bi nîşane ku destê qudretê danî
Di sînga rojhilatê de pesindîde gelek naze
Zozan û Serhed û Bîngol Ararat û Ezerbîcan
Çiyayê Reşt û zaxrosê li dorê kirne perwaze
Li jor û jêr li rast û çep çîmengah û gulîzarin
Ferat û Ducle û Xabûr ji nêv dertên bi endaze
Gelî û dehl devî û şewl cihê şêr û pilinga ne
Di pozê lat û zinaran hêlîna bilbil û baze
Buhayê bostekê nakin welatê Çîn û Maçînê
Beranber mêwekî nabin rez û baxên di Şîraze
Çi pesnê wê bidim îro bi dev xamê timî kême
Durek nasifte kurdistan di dest tola û tolaze
Bi çavsorî sitemkarî dixwî xêra welatê min
Bi zêr û dexl û danê min çiqa ew jîr û canbaze
Çi milet ku welatê xwe bi dest dijmin ve ew berdî
Di dunyayê de pir kême timî jar û belengaze
Li cîhan ku nebî jêre welat û erd û ezmanek
Xulam û bend û kola perîşan li yek aze
Bi darê kotek û zorê welatê xwe ku nestînî
Nemîne ew li dunyayê bela bimre nexêrxwaze
Wekî Tîrêj dibê ta kurd tevayî ranebî ser xwe
Ji bin destê neyaran ew tucar nabî serfiraze.

Şerefxan im

Welatê min çi şêrîne bi gorî û bi qurbanim
Timî pê serbilindim ez bi rûmet û xwedî şanim
Ne Tirk û Firs û Tazî me ji Mîdya û Mîtanî me
Selahedînê kurdî me li textê Misrê sultanim
Şahê Misr û Filestînim pilingê xakê Hetînim
Kurê Behramê çopînim li Bedlîsê Şeref xanim
Ezim Qadyê Mehabadê ezim şêrê serê latê
Li zozanê Araratê seyd xan û Elî Canim
Peyê Mehmûd Hefîdim ez mirîdê şêx Se'îd im ez
Kemal Pîr û E'gîd im ez di bircê de Bedirxanim
Ezim keyxesrewê şevgêr ezim Guhderz ezim ew mêr
Ezim xan Dimdimê cengzêr neyarê şahê Eyranim
Ku Canpolayê durzî me Hemê Mûskê Berazî me
Ebdulrehmanê Şûzî me neyarê Tirk û Romanim
Kurê Faro ezim Sebrî ezim Xalid begê Cibrî
Ezim 'Ebduleyê Nehrî bi xwe Simko û Ihsanim
Ezim pêşmergê Berzanî ku hîmê kurd bi cih anî
Ezim Tîrêj bi şahanî li şûnwarê Kerîm Xan im.

Ey welat

Ey welat im can bi gorî gazina te j' min nebî
Tu dizanî bi şev û rojan ez xemxwarê teme
Rêz û neqşê xameya min navê tey şêrîn û xweş
Her wekî bilbil dinalim ez pesindarê teme
Ger hemû kes aşiqê malê dinê çavên reşin
Ez evîndarê çiya û deşt û zinarê teme
Qebqeba dengê ribatim ku li ser şax û çiya
Totiyê kohê Metînim bazê Hekarê tema
Şîrşîra teyr û tilûra me di nêv bax û rezan
Her wekî şalûr di nêv dehl û gulîzarê teme
Ez sura bayê siba me xumxuma av û çema
Ez dîrokê ser devê milet û komarê teme
Ez delalê dengê qîza me li qirş û qurmika
Dengê qotîna şivan horhora cotkarê teme
Himhima şêr û piling im dengê kovî û şepal
Qêrîna qaz û qulingên deşt û rûbarê teme
Perdê tenbûra şivanim her yek hawakî didî
Rengê bilûra Memê j' koka sipîndarê teme
Xeml û xêza keç û qîza me li govend û sema
Şapik û şalim li bejna canfîdakarê teme
Dengê lîlandin û ew kofya serê bûka me ez
Dengê sazê cejnê Newrozim di avdarê teme
Her wekî rewşa gula me kesk û sor û gewr û zer

Rengê ala ku li banê şah û xunkarê teme
Vîngeha gelyê Elî beg xakî nav perda me ez
Bax û mêrg û dehlê Şeqlawe û Berwarê teme
Berfa Sîpanê xelatim şîp û ava kaniyan
Madena zîvê sipî û cok û cobarê teme
Penc û tîrêjim di nîva çerxê gerdûnê teda
Şeb çiraxê çol û gund û şehr û bajarê teme
Xêz û bendê zendevesta me li gelyê Laleşê
Pîremerdê şehrê Yezdim ez li ber arê teme
Rengê Homan ol perestê pût û latê Azerim
Felsefa Mezdik û Manî neqş û nîgarê teme
Hîmê qesra Serçixanê sûr û benda Amedim
Keleha Mardîn û Dara herdû bajarê teme
Lenger û stûnê pira Bafet li ser dicle me ez
Kavilê Birca Belek rewşa ewî şehrê teme
Torevan û şa'irim îro li nêv xaka welat
Xamekêşim dem bi dem ez xweş nivîskarê teme
Dil bûye îro li min war û cihê derd û xema
Hemdemê jar û perîşan û sitûxwarê teme
Her dema roja te bê ez piştê nadim dijmina
Tu ji min bawer bike dijminê neyarê teme
Ger ku Tîrêjim bi rastî bîr û bawerya m' eve
Ta bi mirnê ger ne wa bim ez gunehkarê teme.

Lawên Cengîz

Bayê sibehê rabe bi ser car û newala
Îro tu xwe bighîne ewan yar û hevala
Çar hêla welatê Serhed û Zozan û Dêrsim
Tevdî tu li hev xe ta bi Mehsert û Qubala
Pirsê bike carek tu ji rêwî û şivana
Pirsê bike ey ba tu ji gundî û ji mala
Pirsê bike carek tu ji wan karkerên bê kar
Pirsê bike ey ba tu ji cotkar û ji pala
Pirsê bike carek tu ji qîz û keç û bûkan
Pirsê bike ey ba ji hejar û bêmecala
Pirsê bike carek tu ji derketyên li çola
Pirsê bike tu j wan girtiyên zindan û çala
Pirsê bike carek tu ji birçî û ji sêwyan
Pirsê bike ey ba tu ji zarok û menala
Carek tu temaşeke li bustan û li dara
Carek tu binêre li rez û mêrg û dehla
Yek ser bê xwedî mane ji bê cot û tevirdan
Ber tev weşiyan îro ji êmîş mane vala
Carek tu binêre li gulistan û li baxan
Meyzek tu li sosin û gul û çîçek û lala
Kanî dijminan girtin nema av tête ser wan

Xuncên sorgula hişk bûne bê şebnem û ala
Lawên Teter û Cengîz û Holakê Mexolî
Agir dane kurdistan rivî jê çûne bala
Bala xwe bidê îro li her alî himîne
Dengê sûstem û top û tifinga nale nala
Ey dijmin bizan kurd bi xwe qir nabî tucarî
Zilm û setema ku lê dikî tu b' sedê sala
Lawên wê gihane her wekî şêr û pilingan
Cenga te dixwazin ne bi xewn û ne bi xeyala
Tev box û beranin xwînê dirjînin bi merdî
Şevgêrê çiyane nevyên Rustem û zala
Mafê xwe ji çavên te ewê îro derînin
Hiner û hêz bêne meydanê xweşî pûç û betala
Tîrêj tim bi ûmîde ji we nifşên nûhatî
Bitstînin ji dijmin doz û tola bav û kala.

Sedam dîn mebe

Serdarê bilind li kohê Berzan
Deng daye cîhan hemî seraser
Şehbazê felek li jorê ezman
Xweş yare û hemneşîn û rehber
Serleşker bi xwe dewrê zemane
Leşker hemî xortên canfîdane
Al perçek ji xemleya cîhane
Tê daneye rengê koh û xencer
Ney dize wekî dibêjî Bexdad
Miletperwere dixwazî azad
Rêzane ji bo nejdadê Ekrad
Hozane bi eql û fikir û tevger
Sedam tu bizane dem bi dorî
Çavê xwe veke ma qey tu korî
Ka Qasim û ka Feysel û Nûrî
Ka ew begler û mîr û şeh û ser
Berya te bûn ew wezîr û xûnkar
Ferman dikirin bi agir û dar
Lê bîr nebirin ku çerxê dijwar
Wê wan têxe bin dolab û lenger
Ew rêça li ser bûn ger li ser bî
Ger wek wan tu jî ne bîrewer bî
Naçare tu dê di gorê wer bî

Nakin bo te fêde kom û leşker
Sed balafir û hezar sewarîx
Deh carî wekî wan qembel û mîx
Berpaş nagerînin çerxê tarîx
Ev çerxeke dijware xwe med ber
Sedam dîn mebe li pêş te mêrin
Hember te hemî piling û şêrin
Cengvanîne kurdin tev bi kêrin
Tîrêjê birûskin toxmê ejder.

Mela

Ey melayê mêr û gernas rêberê kurdanî tu
Rêçenas û jîr û mêrxas serwerê xortanî tu
Rengê heyva çardehê da der li kurdistan mela
Şewqê da bajarê Amed Erzirom û Wanî tu
Zengilê cenga welat îro li Berzan daye deng
Pê şiyar bûn kurdên Tirk û Sûrî û Eyranî tu
Dengê def û sazên şer xweş tên li ser kohên bilind
Ala rengîn ref refe her dem bi dest lawanî tu
Xakî Berzan rengê barûde li rûyê dijminan
Teht û arbeşk û kevir tev bumbene d'meydanî tu
Bayê dijmin ketye bayê kurd rabû ji pê
Pê gerî çerxa felek ev xweş deme dewranî tu
Lêxe ey serdar û pêşwa firsete yefşê medê
Her kesê xayin ji ser ke b' xencera soranî tu
Dehşikên şêst û şeşan paqij bike tu j' wan welat
Ew qirêj û patexur tev gorî û qurbanî tu
Xayin û dînarperest in çepelin tuxmê teres
Alîkarê te û pêşmerge be her yezdanî tu
Dengê Tîrêj wa li Sûrya tim dike qîr û hewar
Her bijî xortên nûhatî her bijî Berzanî tu.

Meyger

Meyger li xurîn im vê sibê camê tijîke
Tu j' denê kevin çavo bela tîr û giran bî
Da îç kim li yek hilmê dilopê tê nehêlin
Pê tîna xwe bişkînim bi xweşya dil û can bî

Ser vala bibî îro ji nîgaş û metala
Sermeste bibin ez bikevim warê xeyala
Da ej bîr bikim derd û kulên van dem û sala
Emrê şêst û çar salan bi serxweşiyê ciwan bî

Da ha j' xwe nemînim ez hiş û sewda bi derdim
Mervo meyperestim ne xwedî sîwak û werdim
Çerxa felekê îro digel wê ez xeberdim
Gilyê me li ber destê Enû-şeyê Rewan bî

Jê pirsê bikim ma ev çi kîne te digel me
Ma qey li dinê kes te nedî kêmtir ji bil me
Ev barê xem û derdan te avêtine mil me
Ev barê giran ranagre ger kohê sefan bî

Bextê me ji alî te reşe her wekî tenyê
Daxwaz û ûmîda me ne kir carek li dunyê
Dijmin te birin jor lê te em hiştin li binyê
Ta kengî emê pez bin ew dijmin şivan bî

Bid min bersivê çerxa felek her ku biprsim
Kanî şêr Elî Seyid Rida şoreşa Dêrsim
Ka xuşka Besê b' rext û tifing bejna bi keysem
Ez birûska dev tifingê me tu jî mij û mûran bî

Ka şoreşa Şêx Mehmûd li Sordaşê xwedî çek
Tirk û Ereb û Ingiltera tev lê bibûn yek
Xapandin bi olê ewî goga xwe ne bir şeg
Ez şûrê bi dest Şêxê xwe me tu yek ji wan bî

Kanî Şêx se'îd ew serekê şoreşa Amed
Vêket ji tuxûbê Ecem ta Zozan û Serhed
Ka Xalid û Fûad kanî ew pesporê Mehmed
Reş kir te li me cerg û kezeb her bê guman bî

Pêjna şoreşa Ihsan kurê Nûrî nema tê
Vêket ji Ararat ta bi Bedlîs û Xelatê
Ka Tewfîq û Xorşîd bi xwe serbazên civatê
Rasim bi xwe me her dem tu jî wek Riza xan bî

Ka textê Mihabad dewleta Qadî Mihemed
Şûrkêşên me kanîn Seyfî , Xoşnav û Siyamend
Ka siwarê li hespa ku li dijmin dikirin cerd
Ez tîreke ser tûj bim tu armanc û nîşan bî

Ka şoreşa Berzanî li dijmin tim bi êrîş
Pêşmergên hinerbaz weko Feyleq dikirin tîş
Ka Îdrîs û Mehmûdê Yezîdî kanî Mamîş

Firset te neda wan tim tu xûz rengê kevan bî

Reş-al te li dildarên me hilda banê gerdûn
Meydana evînê te li wan kir wekî hêtûn
Şehnaz û evîndar tev li ber pêlê xema çûn
Ma çi doza te bi wan re hebû tu b' derdê giran bî

Çipkim ji Cizîrê ne li wî şehrî be zînê
Tacdîn ku nebî kes li mi xweş nakî birînê
Çala çilherîn xweştir ji birc û şehneşînê
Ez Memê evîndarim tu jî Beko Ewan bî

Ez çibkim ji sîpan bê Xecê keçka Silîvî
Bê tîr û kevan çibkim ji wê xencera zîvî
Nêçîrvanê kovî kuştiyê dara bi'îvî
Ez gelyê siyamend tu li min ew êş û jan bî

Çibkim ez ji derbendê ne lêbe surşêrînê
Bê soz û qerar çibkim ji gustîl û negînê
Elmasa bi jehrê bibî dermanê evînê
Ferhadim tu jî pêlek ji wê lehya giran bî

Ew aşiqê hev bûn ez evîndarê welatim
Lê xweş tu dizanî ez ne bê kar û xebat im
Torevan û ristebêjim bilbilê baxê Xelat im
Ez Tîrêjê kurdim tim tu bê nav û nîşan bî .

Dayê

Di nêv cerg û dil û can de te parastim erê dayê
Di pey neh meh û neh rojan te ez anîme dunyayê

Ji çel te ez diparastim ji deng û gotin û peyvê
Bi zarotî ji pêwr-ava ji ber ser û binê heyvê

Te pir şûştim veşûştim ez dipêçandim bi beşkîrê
Bi wî şîr û berê paqij dimêjandim ji pêsîrê

Dema ku ez bigiryama ji rengê torina Mûşê
B'dîrokê bav û bapîran dilorandim di dergûşê

Eger ku ez nexweş bûma digerya tu li dermana
Te ez herdem diparastim ji ba û berf û barana

Li hembêzê li ber sîngê li kolînê gelek cara
Li ser min tim bi tirs bû tu ji tûpişk û ji tîmara

Li ser min her dem û cara bi ax û nalîn û tew bû
Şevên ewr û reş û tarî tu bê razan û bê xew bû

Ji mi r' herdem dinihrandî li ber landik û hêlanê
Li ber germa di havînê li ber serma zivistanê

Li ser min tim dibarandin dilop û hêstrên çavan

Di datûla mi da bû tim di her çax û dem û gavan

Li ber pozê te bû dayê serê min wek şimamoka
Ji te r' hilma mi xweştir bû ji bîna terh û bîhoka

Dema ku bûme şeş salî erê dayê dilovanê
Bi xam û defter û çente te ez şandim dibistanê

Bi delalî bi xwendin dam te ez dam ser riya jînê
Bi karwanê demê re ez gihandim warê zanînê

Dem û dewra tu pê rabû ji bîr nakim meh û sala
Divê herkes bizanin ku dibistana mezin mala

Nezanî û perîşanî ji îro pêve êdî bes
Dema kar û xebatê ye ji bo vî miletê bêkes

Ger ev jîna minî taze ned ber karê welat da bî
Bela heyvanê şîrê te di min êdî ne gerya bî

Tu bawer bî ji min dayê bi can û dil şoreşvanim
Eger herdem ne wabim ez bi xwe hovim ne insanim
Wekî Tîrêj dibêje kurd divê îro hemî wa bin
Bi zanîn û bi xwendin wê xwedanê tac û ala bin .

Agirê Tûr

Agirê pîroz li kohê Tûrê Sîna hilveda
Agirê Zeradeştê Eyranî bî ew pêta li dar
Hezretî Mûsa bi pêxwasî diçû nêk agirî
Dest li ser hevdû vebestin pişt kubik gerden li xwar
Şand ji Mûsa re Xuda darek bi dest kalê Şue'yb
Sahirê fere'wn revîn dar bû li wan ejder û mar
Leşkerê Harûn û Mûsa yem li ber wan kir du şeq
Agirê Brahîm kurê Azer li der xakî Ruha
Bi xwe ew agir bû dîsa kêr nekir pê germ û sar
Pût û latê Azer û Nemrûd û Homan yek bi yek
Ser nixûn bûn levketin pêkve ji hev bûn tar û mar
Paşê Ibrahîm diçû mala xwedê ava dikir
Mekke bû paytext û keşwer qublegeh û şehreyar
Êla Cerhem tev li dor zemzem û ke'bê hêwirîn
Hinga Ismaîlê Ibrahîm li wan bû xwendekar
Mîrza Ismaîlê gorî jê veket alê Qureyş
Bav û bapîrê Mûhemmed serbilind û namîdar
Qehremanê çerxê gerdûn dijminê latê Ereb
Hemdemê jar û feqîran zor neyarê koledar
Rêberê rahê dirust pêximberê dewra zeman
Pişteмêr şêrê 'Elî bû dest bi şûrê Zulfeqar
Hemneşînê wî ebû Bekir û Osman û 'Umer
Ketne ola nû bi bîr û bawerî soz û qerar
Ola pêximber êrîş da pût û lat û senema
Textê Herqel şahê Romê wî di bin de hate xwar

Gawir û bê dîn hemî revyan ji ber ola temîz
Tariyê koça xwe barkir şewqê da herçar kenar
Dîn li dunyayê belav bû koletî êdî nema
Haştî ket dewra cîhanê ol bi xurtî ma li dar
Hêvîdare her demê Tîrêj ji Yezdanê mezin
Têxe ber wê şewq û tavê jê nebî bê pişk û par .

Afîtab

Ey afîtab rewşa dinê
Her dem ji bareş der dibî
Çaxê ku tu d`çî ber bi xwar
Çima tu jar û zer dibî

Pir zer dibî ew gewd û qurs
Xuya dikî bi lerz û tirs
Nadî kesî yek peyv û pirs
Çaxê ku tu têwer dibî

Tişkî veşirtî tê heye
Ne'l gor hiş û hayê me ye
Ma qey tu ne b'destê xwe ye
Tenha tu bê hiner dibî

Roja meyî rohnî û geş
Tu tim dikî tarî û reş
Laşê me tim xav û nexweş
Pê mest û lal û ker dibî

Çavên me par nabin b'şewê
Em ser didin dewra xewê
Cihan bi tatûla ewê
Bê lebt û bê tevger dibî

Ey şah û serdarê zeman
Semtek dirêj û pir giran
Davêje ser xakî cîhan
Rohnî ji ber ezber dibî

Xesma ku bê sûc û sebeb
Tu l' me dikî tarî û şeb
Xuyaye ku tu b' qehr û kerb
Ji dûryê azer dibî

Çaxê diçî ava ji ber
Perdake reş davêje ser
Tarî dibî her cih û der
Lê Ehrîmen keşwer dibî

Keşwer dibî lê Ehrîmen
Dijminkî dijwar û kevin
Neyarê tuxmê ins û cin
Dunya ji ber kerker dibî

Hespa xwe yî boz wek nigar
Çawa didî destê neyar
Peya dibî ew lê siwar
Hember te ew berber dibî

Çawa didê vê firsetê
Vê tac û al û şewketê
Zanim nema j'destê te tê

Rengê te şah û ser dibî

Êdî me xweş nasî ji hev
Ku felsefa Zerdeşte ev
Sûnda b'xudanê roj û şev
Her kes ku pê bawer dibî

Ev bîr û bawerya mine
Du hêz li dunyayê hene
Hurmiz , Ehrîman yê dine
Ta ku cîhan ezber dibî

Hember hevin ew herdû hêz
Tim wek hevin bê meyl û mêz
Tîrêj bese qir mek tu pêz
Tev ku tu pê perwer dibî .

Cenga Selîbî

Carekê Qedîs Liwîs olperestê Ferensîs
Bi sêsed hezar leşker tev mêrxwas û cengewer
Bi gurz û şûr û mertal bi kuflet û koçemal
Bi gemya ketin behrê berê xwe dane Misrê
Ew serdarê selîbî hat Salihê Eyûbî
Bi çavsorî girte ser jê dixwestî ceng û şer
Salih Eyûb şehê jîr rabû ser xwe bi tevdîr
Xwendekarê dil aram qehremanê Misr û Şam
Çi bi roj û çi bi şev ewî leşker daye hev
Leşker dî bêkar û bar ne xurdê hêza neyar
Tev pêxwas û belengaz ne serhêz û ne serbaz
Ji hevketî perîşan tev Çerkes û Tirkuman
Hin Erebin di bêkêr çavê wî ji wan nebû têr
Ku salihê pêşwa şand bajarê neynewa
Cem kurê xwe Toran-şa serekê mîr û paşa
Toran şa ey kurê min çar hawêrî min dijmin
Bi leşker û kom û lek li dor Misrê bûn xelek
Leşkerkî bê ser û bin cengê ji min dixwazin
Ji niha û ne dereng divê tu bê ey leheng
Digel bîst hezar siwar xortên kurd ên fidakar
Ger daxwazam neyê cî Misr ji dest me diçî
Dê Liwîsê setem kar lê dibî şah û xûnkar
Toran- şahê dilawer dema bihîst ev xeber
Rabû bîst hezar gernas hemî Egîd û mêrxas
Pêkve kurdên şeg û jîr tev bi şûr û rim û tîr

Ber hev kirin weke şêr berê xwe dane berjêr
Cengevan û serfiraz weke teyr û mirxên baz
Toran şa bûye serdar bi rêketin ew siwar
Geh li vir û geh li wir ta ku gihane Misir
Digel wî leşkerê xwe bû mêvanê bavê xwe
Misir bûye hêlekan goga li ber du şegan
Pêlên leşker di navê wek keleka ser avê
Salih divê firsetê mixabin çû rehmetê
Dema li wan bû şeveq salih birin mala heq
Serekê qehremana ket bin axa cebana
Ew şa ne bû vê dorê bi hisret çûye gorê
Toran leşker kirin rêz kirin du pişk û du hêz
Hêzek li çep yek li rast herdû hêl wî diparast
Asê kir herdû tenişt belê orte vala hişt
Zanî dijmin wê gavê êrîşke wê di navê
Di berbangê de herdû kişyane ber hev û dû
Dijmin êrîş da ortê lê nizanî ket wertê
Orte erê vala bû lê xefk têde vedabû
Bê lêdan û şer û ceng pêde çûn ew pêzeveng
Ku bi şûr û mertala tev ketin cihê vala
Toran şahê pêlewan ji du hêlan hate wan
Leşker li wan hatin hev ku roj li wan kirin şev
Meydan bû agir û pêt dê weledê xwe avêt
Ku leşkerê Toran-şa ser davêtin ji laşa
Laş li ser hev bûne hok xwîn li erdê bûye cok
Himîn ket pêlewana navtêdana berana
Xwar bûne rim ji kerba şûr ko bûne ji derba
Tîr wek qelemteraşa cê wan nema di laşa

Toran şahê hinerbaz di şerde bû serfiraz
Liwîsê bê soz û bext leşkerê wî ji hev ket
Ew leşkerê boş û pir nema ji wan tenafir
Tev kuştî û birîndar tev hêsîr û dîl û jar
Tiştê hate serê wan nayê gotin bi ziman
Pey deh rojan bi hejmar ew Liwîsê gunehkar
Digel heştê serbazî tev pêxwaz û sertazî
Bi dest tev kirne hêsîr anîn bi qeyd û zincîr
Sipî sax û bê birîn li ber toran- şah danîn
Toran-şahê dilovan peyveke xweş gote wan
Vekin qeyd û zicîra te'dê medin hêsîra
Ne bi derb û lêdanê gişa têxin zindanê
Pêxiberê dilovan wisa wî kirye ferman
Ferman dabû Toran-şa go bavêjin va laşa
Ew term û laşên genî kirin behra bê binî
Tiştê bû kesî nedî kuflet maye bêxwedî
Di nêv behra û ava birçî li ber delava
Toran-şah got wezîran berdin evan hêsîran
Tev Liwîsê bê wicdan dijminê tuxmê insan
Bê hêvî û bê guman polî poşman vegeryan
Pîrek tev mane jinbî zarok tev mane sêwî
Misr tev rizgar dima şer û qewxe tê nema
Pir xweş dibû ew welat j'roava ta roj hilat
Belê kesin dest dirêj ziman çepel û qirêj
Pîs û dixsok û tole reswa û bend û kole
Lê rêberê wan kesa ji Tirka û Çerkesa
Lêv li Toran digestin kuştina wî dixwestin
Piştî mehkê bi şûran êrîş dibirne Toran

Ew nevyê selahedîn boxê Misr û Felestîn
Girtine ser wî bi şeb kuştin bê sûc û sebeb
Şahê bi tac û ala textê wî maye vala
Xwedyê Misr bûn Tacîk bûne serdar Memalîk
Misr ket destê kola Eyûbî man li çola
Çerxa dem ey kurên baş , geh li pêşe geh li paş
Çira kesî ezbenî tim vêketî namînî
Xwezya Tîrêj çira geş ser û canê we 'j mi'r xweş.

Pale

Ey pale pale pale palê das û qînaxa
Rabe rahêj dasa xwe here gundê Êlaxa
Berî serma kanûnê qutê zaroka deyne
Ji te'r şerm û fehête gera nav mal û taxa
Ey pale pale pale , palê deşta Barava
Rahij das û qînaxa , roj hatiye delava
Ger ku nekî xebatê tê tim xwas û birçî bî
Ev zêr û mal û dewlet tucar nayên bi lava
Ey pale pale pale palê deşta silîva
Dasa te ya bi xişxişk doxa wê sade zîva
Germa havînê tûje tu xwêdanê vemale
Di meydana xebatê wekî boxê Birîva
Ey pale pale pale lawkê mi palê deştê
Dasê bavê milê xwe qînaxa têx ber piştê
Hoxa te pir dirêje zadê wêna qubale
Genim jî pir bi tofe l'milê palê mi xweş tê
Ey pale pale pale palê berya Mêrdînê
Rabe rahij dasa xwe berî êvara înê
Zarok tazî û birçî bê pêlav û kirasin
Zad hatiye ber dasê ji ber germa havînê
Ey pale pale pale palê deşta Hekarê
Qînaxa têxe avê berî danê êvarê
Dasê tûjke bi heste zend û bendan vemale
Nan nadî zarokê te rûniştina bin darê
Ey pale pale pale palê kevanê kêrê

Rabe rahij dasa xwe here deşta Hewlêrê
Pir bik zêr û derava qûtê zaroka deyne
Wekî Tîrêj dibêje dagir tu xurc û têrê .

Mûyekî sipî

Xort û ciwan bûm emrê mi sih sal
Bayêm bilind bû ne xem û xeyal
Kuncîlê li min çox û qimaş bûn
Bi kum û kolos bi şapik û şal

Xwîna ciwanyê ez hildidam jor
Herdû dêmên min mîna gula sor
Dema mi xweş bû bi kêf û şahî
Şewqa dilê min dida Tor û Zor

Mûyekî sipî kêfa min şikand
Dolabê zemên li min wergerand
Ciwaniya min ji min bi dûr xist
Sed ku û keder di dil min de çand

Serê sibakê şiyar bûm ji xew
Bi dengê bilbil bi qebqeba kew
Dev û rûyê xwe mi şûşt bi avê
Bi mir ev çêbû bi roj ne bi şew

Min bi neynikê li xwe dinêrî
Ji gerden û rû heya bê serî
Mi dî di nîva porê minî reş
Mûyekî sipî têde wek hirî

Li ber çavê min bû wek melkemot
Can û ceger û dilê min disot
Ez vedciniqîm bi dîtina wî
Bi kerb û bi kîn mi ev jêre got

Tîrêj :
Tu tenê li vir çidke ez benî
Di vî cihê reş şeva wek tenî
Ev cihê tarî warê diza ye
Gelo tu doste weya dijminî
Mû:
Bawer bik ji min ez dost û yarim
Ez ne dijminim ez ne neyarim
Destê biratiyê emê bidin hev
Ez takî mû me , ez bê zirarim
Tîrêj:
Ji kîja cihî ji ku deverê
Çawa bêyî min , tu hat vê derê
Rastî bibêje berra te nadim
Heya deh roja bi sozê berê
Mû:
Bira rêwî me , ez dûrî destim
Şev li min gerya , ez jar û mestim
Jar û belengaz , pêxwas û birçî
Kesî mi nîne li vir vewestim
Tîrêj:
Ti ne rêwî ye ne tî û birçî
Xerîb dibînim , ez te li vî cî

Ev tiştê te gotin , ne ket serê min
Divê tu rabe , ji vê der biçî
Mû:
Heya tu hebî ezê mêvan bim
Heya tu tîr bî ezê kevan bim
Çawa tu zanî ji xwe r wisa bik
Heya tu pez bî ezê şivan bim
Tîrêj :
Kê te şandî vir , bi qelawizî
Porê minî reş , tevdî bidizî
Mû bi mû yekser , bughere sipî
Qet ez nazwazim , vî reng û terzî
Mû:
Ne dizim Tîrêj ne keleşim ez
Lê şebçeraxê şevê reşim ez
Çar hawêrî xwe ez dikim rohnî
Agirê zerdeşt li Laleşim ez
Tîtêj :
Bi derzîke hûr wê bingeha te
Ezê bikolim kok û reha te
Devê mûçingê bavêjme jorê
Ji bin hilînim asêgeha te
Mû:
Koka mi kûre dûr û dirêjî
Penc û rehê min gihane mêjî
Ne mûçinga te , ne derziya hûr
Tu kêrê nakin , tu j' xwe r dibêjî
Tîrêj :

Eger serê te bighê ezmana
Tu qet mi nakî kalê zemana
Ezê te bikim piçik û parî
Bidim ber devê kêr û gwîzana
Mû:
Roja cîhanim hatim delava
Heyva çardeme , ez naçim ava
Sed kêr û gwîzan mi natirsînin
Ezim birûska nêv ewr û tava
Tîrêj :
Pêlek ji lehya xema te anî
Li ser serê min îro te danî
Nîşana pîryê li min xuya bû
Rengê ciwanyê ji min hilanî
Mû:
Cilkeke zîvim li ser serê te
Taca zêrînim li keşwerê te
Ji min metirse ez xweş hevalim
Hemî aqilim ez yawerê te
Tîrêj :
Çelapekek berf ji ya Serheda
Li ser serê min te sîwan veda
Li min tu bûye şûrê qederê
Ferman li xort û ciwanya mi da
Mû:
Xem û derda mewx tu hê ciwanî
Ez ne dijminim tu baş dizanî
Ez taca serê aqilmenda me

Di her wextê de di her zemanî
Tîrêj :
Wekî derwêşan tûr li mil û pî
Dinyê li hev dim qapî bi qapî
Ciwanyê êdî nema dibînim
Piştî vê tirsê vî porê sipî
Mû:
Rustemê zalê rabî ji gorê
Guhderz û Xesro xwe bidne dorê
Tu xweş bawer be tu çiqê nakim
Mi naşikînin bi darê zorê
Tîrêj :
Tu şûrê heqe ji genca yezdan
Da der ji nîva nîqab û perdan
Wê çipke Tîrêj darê xwe danî
Tu dest li ber te nayêne hildan .

Ne bi qurretya dev e

Ma rûmeta şi'rê çiye ?
Ned xidmeta millet de bî
Ronahiya şi'rê çiye ?
Pesnê welat ku tê ne bî
Çibkim ji wê şi'ra rijî ?
Danagre sewda û mejî
Derdê dil û can najkujî
Çaxê ko cewher tê nebî
Cewher divê hilbe ji nav
Bihnê vedî rengê gulav
Pê xweş bibin cerg û hinav
Hemdem û yarê xwende bî
Wek rûn û qîmaxê miya
Mîna bîhok û hirmiya
Moçê bidî dev birçiya
Çiqa bixwî jê têr nebî
Ew xwarina can û dile
Derman ji bo çavê kule
Saz û awazê bilbil e
Gul pê ji xaran derdibî
Şi'ra rijî naçirusî
Wek sorgula tim çilmisî
Bêhn û bexê nadî kesî
Jê xwendevan dilsar dibî
Ku tê nebî bêhn û bexe

Bilbil tucar nayê rexe
Şebnem ji xunçê navexwe
Lê nikl û dev ziha dibî
Zar û zimanê miletan
Qumaşeke pir mal giran
Erzan meke ey torevan
Haj xwek tu bê rûmet nebî
Haj xwek neyê bezmê bi zor
Ferhenge û tarîx û tor
Yên miletin her çax û dor
Sivik meke têd bin vebî
Tim gotina Tîrêj ev e
Tor ne bi qurretya dev e
Qet ezezî b' te nakeve
Tore ji torê der dibî ..

Ziman

Gelî kurdên bîrewer keç û xortên xwendewar
Ev zimanê mey şêrîn xuyaye tê ber bi xwar
Gelek şerm û fehête zimanê bav û kala
Em îro va dibînin ji hev dibî tar û mar
Gelek peyvên biyanî yên Firs û Tirk û Tazî
Cih girtine di navê têde bûn wek bizmar
Mane û hebûna me zar û zimanê meye
Ku ew herin namînin ji mer tu kok û bintar
Her wekî Laz û Qecer ku zimanê xwe berdan
Ew ro bi ro winda bûn tev mane bê cih û war
Ji hev ketin ji wan re nema tu erd û ezman
Ji cîhanê beta bûn di bin çengê koledar
Em tevde xweş dizanin ku dewleta Osmanlî
Xwedî text û seltenet bi leşker û payedar
Kir bin lep û zefta xwe miletê Rom î Ereb
Heya bi Hind û Maçîn Sirp û Yûnan û Bilxar
Belê evan miletan ji bîr nekir tucarî
Dîrok û tor û ziman filiklorê xwey kevnar
Her dem li dardixistin bi awaz û sazê xwe
Dîlan û reqs û govend sersal û cejna komar
Bi ziman û tora xwe xwe deranîn bi xurtî
Ketin warê jiyanî ji nav pencên setemkar
Milet bi zimanê xwe pêktînî hebûna xwe
Di nav gelê cîhanê navê wî tête hejmar
Lê digel ziman divê xwendin û hem zanebûn

Bi kawikî nezanî nabe xwedî tac û dar
Wek Tîrêj ku dibêje evî cawê xwey giran
Sivik mekin tucarî bi germî werne bazar

Ez û Xame

Xameya nazdar û çalak , sebr û şêrîna dila
Destegîra xwendevana hemdema derd û kula
Bendê qanûna digel dîwan û tarîx û edeb
Tu li pê hev dinvîsî ji dema qal û bela
Ma tu naweste wekî min digirî tub şev û roj
Hêstiran herdem dibarînî li ser van rûpela
Îske îske serlijêre rondika nakî betal
Tu li ser jar û esîr û pakrewan û şêrgela
Tu zirav her dem dirêsî lê tu bê nalîn û deng
Bawerim ez ji kevin de tu bi van êş û bela
Pa xwezî carek mi zanîba bi êşa tey giran
Minê Nafiz banya ser te ji gorê mezela
Dar û derman minê anîba ji çar goşê dinê
Heb û derzî minê çêbikra ji tuxmê sorgula
Şîr di çermê şêr de anîba ji ter bikra şerab
Şebnema xunça bi derxista ji niklê bilbila
Lê mixabin wek mi pîr bûye li te ev jan û êş
Fêde nakin dar û derman ne niviştokê mela
Were em herdû bi yek bin çi ku êşa me b yeke
Em bidin ber hev dijî pîs û qirêj û çepela
Haştiyê îro bixwazin em di vê dewra dinê
Da neyê me gumguma sarûx û dengê qumbela
Wê çike Tîrêj şikeft ku teng be ço tê hilneyê
Kar û barê gel girane daye ser herdû mila.

Mirin çiye ?

Ez mirinê dibînim ne bi xewn û xeyala
Gurkî birçî û hare li ber derê her mala
Têr nabe ew tucarî ji goştê ademîzad
Devê wî sore herdem ji xwîna bav û kala
Tebakî bê haweye dijminê jînê ye ew
Bi ber gorêv dişînî pismam û ap û xala
Pencên xwe ew di laşê mirova de dikî xwar
Radqetînî ji hevdû destê yar û hevala
Dem û wext jêre nîne didî ber xwe ketûber
Pîr û kal û ciwana çi biçûk û mendala
Belê heqya wê eve cuda nakî ji hevdû
Belengaz û derwêşa ji paşa û qerala
Ey kesê jar û reben bela dilê te xweş be
Mirin êşa wê yeke tev kêferat û nala
Çi li textê zêrîn be çi li xakî zemîn be
Çi di nava livînan çi bi şûr û mertala
Serok û mîr û zengîn dema diçîne gorê
Destê wan ji zîv û zêr wekî destê te vala
Berî dahijne gorê wekî te lê dipêçin
Çend gaz cawê neşûştî ji bedêla qerpala
Çi kesê tê dunyayê pêxwase şilfî tazî
Wê têkeve bin axê tazî û bar şewala
Gelek qaqil û hestî ji hin gora têne der
Hemî kevn û rizyayî ji hezarên di sala
Ew kalaxên rizyayî serê box û berana

Zend û bendê xatûnan tilyên di çav xezala
Ew hatine veşartin di nêv axa cebana
Beta bûne ji dinyê di kortal û goncala
Dinya siya darê ye ji mere ne tu ware
Bêbext û xapînoke leylane pûç û vala
Kêrî dinyê nehatin me dawî jî bi derda
Wek rêwiyê windayî li wan çol û newala
Ey Tîrêjo bizane ku ne efwa xweda bit
Gunhê te berze nabin bi gotin û galgala .

Derdê Siyamed

Yekî keçek ji xwer xwest gelek nazdar û delal
Xort bi navê siyamed keç bi navê gulîzar
Di deverkê min ew dî pirsa halê wî mi kir
Ku mamoste lê nepirs qelen sed û çel hezar
Bi sê çekê bûkanî bi xelat û ber derî
Bi ber bisk û gerdenî bazin û cotek guhar
Hesabê mal û sûkê li hev derneket ez benî
Bi çil hezar wereqe paşê ez mame deyndar
Xwedyê deyna her se'et yek dihat û yek diçû
Bi erzanî min firot xanî û pez û dewar
Mi xaniyek kirê kir li ser du max û nîva
Bê cîcerg û bixêrîk ne serşok û ne berar
Xanî kelpîç û herî bê kulek û pencere
Wek hezaza kevoka zivistanî timî sar
Pişta xanî kertekort bê seyek û av rêjin
Teyrok û berf û baran çawa tê wilo tê xwar
Niqiniqa dilopa dengê mişk û çirçirka
Reqs û dîlan li ber tê sazê xurpo û tûmar
Ma ez çi bêjim hundir bi qurbana ji dervebi
Mala cuhaye her dem terya mişk lê nabe ar
Şewtiyo mala gure ne dan û ne birxule
Bejn tît û mal meçît rewşa malê ma kewar
Bêrîk vala ye herdem ji dînar û derava
Zikek têr û deh birçî ne xebat û ne jî kar
Çendî dikir polepol hêstir li rû bûne rêz

Nema devî wî gerî nema xwezî diçû xwar
Pê şewtî dilê min gelek gunhê mi pê hat
Ketim warê xeyala mîna 'Eloyê xemxwar
Gelo ma ez çi bêjim kulê min pir giranin
Xelk gihiştin ezmana bes em tenê man li xwar
Ji vî hişê meyî pûç tev kawik û nezanin
Gavek me pêş ve navêt bi deh gava man ji par
Bi quretiyê civata em xwe zana dibînin
Dema ku ser bi ser tê em tev dibin gunehkar
Ma ne şerm û fihête keç û qîzên me îro
Di bezma keçfiroşan tên firotin bi bazar
Bê mad û çav bi hêstir lêv zîz û gerden ziwa
Dil şikestî perîşan bê rûmet û tengezar
Keç û jinên cîhanê tev ketne berlemana
Pêş ketin ew li her der bûn wezîr û payedar
Margirêt û Endêra bûn serekêd wezîra
Elîzabêt li London bû paşa û xwendekar
Velentîna tiroşkof gihiştiye ezmana
Kerazona Ekîno li Filipîn ser komar
Divê ku em nedin dû vî aqilê zingarî
Dem di ser re derbas bû maye qirêj û gemar
Gelî kurdên bîrewer mafên keç û jinên me
Tev ji me tête xwestin ku em bibin alîkar
Ku destûrê bidin wan bi zanîn û pêşketin
Di rûpelê tarîxê da em em nebin gunehbar
Bela navê me êdî bi qencî bête xwendin
Tîrêj dost û hevale xêrxwaze her dem û car.

Diyariya D.Kamîran

Kamîranê dilovan tu bi nav û nîşanî
Li kurdistan tu îro keyxusrewê zemanî
Şewqa roja me ya nû dida welat seraser
Rohnî dikir çol û deşt heya zozanê banî
Ew sitêra mey bilind şeveq dida cîhanê
Çi karwan û çi rêwî wextê xwe pê dizanî
Belê mîrê mi îro çiqasî em dinêrin
Li ezmanê me kurda nema dikin xuyanî
Gelo mij û mûranê sî girtiye ser wana
Ji vî bextê meyî reş nakin rohnî li banî
Diwêt eger nama be emê ji ter bişînin
Li ser baskên di teyran ji xwîna erxewanî
Qelem eger nema bin tilyên keçan û bûkan
Bikin qurz û bişînin qelemin wek tu zanî
Qelen çiqa biha be , ji ber nadin xwe alî
Têde bidin mal û milk digel jîna ciwanî
Stêr û roja xwe îro wek berê em dixwazin
Ji kulek û pencera şewq bidin her xanî
Ji hozanê mey bilind Tîrêj ûmîdeware
Ko bide bersiva wî belê neb dilgiranî.

Civînek min digel D-Kamîran li Libnanê di sala (1943) ev helbest min diyarî wî kir ji ber ku Sitêr û Roja nû bi destê wî ji Libnanê ji mer dihatin lê du sê meha ew herdu rojname hatin birrîn û nema

derdiketin ji ber vê yekê pirsa me ev bû. Lê mîrê mey hêja dîsa ji mere şandin.

Gilî karê qelsa ye

Mirîdê Laleşim îro Li ber arê Zeradeştim
Sersar ateşim îro ku sersotim ne ariştim
Ji dest pîrê muxan nûşîm peyalek badeya taze
Li hurmizgeh di hev werbûm wekî çerxê dialişt im
Nema mi b xwe dizanî qet ketim warê xiyalan ez
Li ber 'erşê xuda el cem melik taûs dirûniştim
Dema bê xirqe û bendik didî pêsîr qeliştî me
Ne pirsî qet li min carek bi xeyd rabû tenê hiştim
Ji wir ez daketim 'erda berî min daye mizgeftê
Mele û şêxan didîn ez ne bi keşkûl û rih û xiştim
Li min hovenedan yek ser ne pirs û bersiv û gotin
Wekî murxê hejar ku l ber çem û avan diponiştim
Ji wê hatim kiniştê lê bi xwe ez bê selîb û xaç
Keşa jî guh nedan min qet bi bal dêrêve negihiştim
Ne taûs rû didabû min keşe û mele dibûn dijmin
Wekî goştê li ser sêlê ji her alî ve dibrişt im
Çi fertona serê Nûhe ji derya Hind ko lê rabû
Di nîva bager û pêlan di wê avê de ew geştim
Di meydana şeg û holan wekî gogê rewanim ez
Li ber kaşwên kevot ez bê ser û ling û zik û piştin
Me rojek xweş nedî carek heya kengî ezê wa bim
Gilî tim karê qelsaye bese derdo te ez kuştim
Li cem zana xwedî şanim bi rûmet û ne erzan im
Li cem van olperestan ez wekî beba û leymiştim
Heya sax bim ezê wa bim xudanê şi'r û besta bim

Tîrêjim ez ne bêpar im ji 'ilm dagirtî û mişt im .

Nisêbîn

Ji can û dil li te pîroz be ey şehrê Nisêbîn
Digel baqek gulê kesk û zer û sor , ala rengîn
Hela rabe xwe wek bûkan bixemilînî ji nîro
Bela xort û zerî bên reqs û govenda te îro
Ji Kermêt û Cipiltînê ji Şe'banê ji Sîtê
Ji Dêrcem û Metîna ji Bêrtê û Meçîtê
Te bughêzin ji kur amê re bûka ser bi xêlî
Bi darê kotek û zorê eger dijmin nehêlî
Ve xortên te gihiştin tev bi hêrs û dilşewat in
Di cengê de li meydanê fidakarê welatin
Wekî Zinar û Salih her wekî Reşo û Zana
Ruhê şêrîn kirin gorî , ewan xort û ciwana
Ji bona serxwebûnê ew ketin rêza şehîda
Di gel karwanê Mezlûm û Kemal û wan egîda
Nisêbîna bi nav û deng cihê box û berana
Li kurdistan tu bû dayka cil û sê pakrawana
Ewa navê teyî sêrîn qelemkêşê negarê
Bi tîpên zêr nivîsandî li ser enya buharê
Di tarîxa welata de gelek koka te kûre
Ji dewra Mîd û Mîtanî de hê bêtir tu dûre
Me wext nîne ku dîroka te bêjim ez di virde
Ji ber ku pir dirêje bengehek asasê kurde
Di çala û di zindanan de girtî bê jimar in
Çi ku zindan du qatin hin li jorin hin li xwarin
Heval Hogir tu rabe j'rex Hebîsê tornê malê
Tu çend xortan bidî hevdû ji Zorava ji Çalê

Ji Talat û Tinatê hem ji topraxa Letanê
Ji Herbê û ji Golê û ji Qesra Serçexanê
Bi berbangê re bigrin ser Nisêbîn wek pilinga
Derê hebsan bikin perçe bi qûndaxên tifinga
Ewa girtyan bi derxin ta digel we ew bibin yek
Ku êrîşek giran hûn bidne ser qişla Silo beg
Wekî Tîrêj dibê êdî bese ma heq rewaye
Ji me pêve di bin destê neyaran kes nemaye .

Cê bilbil û şalûra

Zalim ey felek ma çi zû fermana te rakir
Qolê xwe hejand te ser û baskên xwe li ba kir
Bazîkî ciwan bûm ez li rû qada cîhanê
Hêlîna mi îro te bi destê xwe xerakir

Wek Evdalê Zeynê bûme dengbêjê welatan
Ez mîna qulingê li serê zinar û latan
Derbek te li min da per û baskên min şikandin
Bê sûc û guneh pir te li min cewr û cefa kir

Baxê min tijî gul bû ji her tuxme û renga
Cê bilbil û şalûra bi sed awaz û denga
Ava ku ji Bîngolê di çû ser hemî çikya
Kanî te ji bin girt û bi destê xwe ziwakir

Dara minî ber girtî bi şax û bi gulîka
Ew şax û gulî tev xemilî bûn bi kulîlka
Ber girtibû lê çipkim ewê ber tev weşandin
Ku bakî Qerejdaxî li wê darê te rakir

Ew xanî û qunaxên di min tev kirne kavil
Xwarnam nanê genim bû îro garis û kakil
Wek Sedamê faşî ew gunehkarê Helebça
Kîn û dijminayî te li min îro xuya kir

Kevrên di newala hemî derxistine bala
Lê hîmê diyara hemû avêtin newala
Rovî û çeqel ketne cihê şêr û pilinga
Wa şêr û piling mane li der kê wek te wa kir ?

Heta ku hebin ez bi te re b qayîş û bendim
Qet ser natewînim ji te re ku ser bi derdim
Da ez di xebata miletê xwed herme gorê
Ma kê weke Tîrêj can di vê rê de reha kir .

Xerîbin em

Bi derdê dilke ho meyger ji mir bîne tu wê camê
Vexum da pê xwe aza kim ji vê xefkê ji vê damê
Ezê toba xwe bişkînim bi derdim werd û mizgeftan
Gelo ma qey ji mer maye nimêj û paçê ihramê
Di warê best û torê da çi ez bêjim li min megrin
Ji ber ku dil birîndare setem takî cehenamê
Eva kurd tên biriştin tev bi xaza xerel û jandar
Bi firokên mislmanan bi dest Sedam û nîzamê
Ne hirçin em ne hovin em mirovin em jî insanin
Di nîva rojhilatê de emin bêkes li hindamê
Tu pîrê olperest û hîn ji Quds û Meke û Ezher
Ne pirsîn qet li me carek xerîbin em di islamê
Bi qirbûna me kurdan tev dirust îro dibînin ew
Ji lewra ez dikim hawar bi devrîşa serê xamê
Bela dengê mi bighêje welatê rojhilatê tev
Heya bighêje roava ne hatin kes li me rehmê
Eger carek temaşakin li dîroka cîhanê ew
Li bendê kurd û kurdistan li dîbaca şerefnamê
Ewê hinga bizanin em ne bê tarîx û bê cîne
Dixwazin serxwebûnê wek Nîgaragwa û Vêtnamê
Wekî Tîrêj dibê her dem di heqê med gunehkarin
Ji Sen'a û Xelîc heta bi Mexreb le ji bil şamê .

Xaza xerdela

Kurd ji meydanê tucarî pişтê nadî nareve
Neditirse ew ji kêmaw û xaza xerdela
Dijmin qet wî naşkînî ew bi qûtqûtê tucar
Ne bi tang û top û balafir û toza qumbela
Bûye 'adet jêre her dem kuştin û talan û ceng
Deşt û zozan têne xemlandin bi xwîna şêrgela
Kurdistan qet nabe ya we ey sitemkarên Îraq
Mexelê şêr û pilinga nabe warê çeqela
Ceng û şer herdem li dunyayê hene wê tim hebin
Lê kesî wek we nekir di tu rijêm û komela
We li kurdistana rengîn sê hezar bajar û gund
Tev kirin kavil û wêran bi tirêks û dîzela
Navê kurdistan dixwînin ferşik û hîmê welat
Tîpê sansekirît û mîxîne , ne xêzên rûpela
Cenga Eyran neh sed û pêncî hezar xortên 'Ereb
We li ser kir bê sebeb tev bûne şîva qertela
Hûn binêrin li pirêza xwe gunehkarên welat
We ji wan xort û şepalan li Iraq kirye xela
Ev hemî tiştê we kir êdî bi wer naçî serî
Ew ruhê şêrîn ne dûr wê l we bibe qîr û bela
Ey 'Iraqa bextereş şensê te qey her dem eve
Tu di nîva rojhilatê tim cihê derd û kula
Tu di dewra Ebdullah kurê Ziyad goleke xwîn
Mêrkujê Mîrza Huseynî pakrewanê Kerbela
Ji heyamê wî sitemkarê Hucacê Seqefî

Te nedî rojeke xweş her dem bi axîn û bela
Dewra Teymûrling û Holako gunehkarên cîhan
Şehrê Bexda bûye kavil ji êrîşa Mexula
Ku ji wî çaxî li ser te gumgum û bahoze tim
Xanim û xatûn ketin şûna gemar û gendela
Ew heyam û dem li te bûne hemî jana zirav
Lê belê xeşma evan îro xwe berda ser dila
Ereb û kurd tevde rabin dest bidin hev merdino
Ma nebes êdî xwe azad kin ji dest van çepela
Evî kabûsê giran rakin ji ser xwe zor bi zor
Desthilanîn fereca xêrê ye neb dû'ê mela
Bi sîwak û nifira kes naşikînî dijminan
Ço ji ço tim vedgere lê ne bi lahewlewela
Her wekî Tîrêj dibêje şer ku hat piştê nedê
Dest bide darê tifinga paşê bêje ya ella ..

Helebçe

Ey Helebça birîndar
Ji bo keç û kurên xwe
Şehrê bi nav û çeleng
Qîz û xortên te jêre
Bi wan bumbên kîmawî
Pênc hezar hatin kuştin
Kê wek te kir ey Sedam
Ne Nîronê li Roma
Cenga sala hezar û
Hitler daxiste cîhan
Koma gelê cîhanê
Ma hûn kurda nabînin
Erd û ezman seraser
Fîxan û qîr û hawar
Li ber çavên we îro
Bûne qirik pîr û kal
Ka dadgeha cîhanê
Kurd bûn berxêd ber kêrê
Sedam bi vî derdê xwe
Jina kurd wa bibêjî
Xewna bi şev te dîtî
Miletê kurd heqê xwe
Tu wek masyê b'kefteleft
Çiqa tu l' ber xwe bidî

Horoşîma kurdistan
tu îro bû goristan
tu bû hêtûnek agir
bûne êzing hûr û gir
yên rijêma bê xelat
lê şeş hezar perşewat
çiqa bê bext û olî
ne Holakê Mexolî
nehsed û hem sih û neh
wek te nekir ev guneh
çima dengê we nayê
di vê wert û belayê
li wan bû agir û pêt
dê weledê xwe avêt
bi agir têne sotin
keç û qîz û mêr û jin
kanî mafê mirova
di koza û di gova
tu dê bimrî nexasim
berê salkê nelazim
tê bi çavan bibînî
wê zû ji te bistînî
ku têkeve çiravê
her tê bimrî di navê

Xelas nabe j' dest milet ger tu bighê Merîxê
Wê rojek bê te bavên devê çerxa tarîxê
Qir nabe kurd tucarî bi kuştin û bi talan
Doza xwe pêk neyînî şûrê xwe nake kalan
Ji can û dil tim eve bîr û baweriya me
Ku em jînê dixwazin xwîne şop û riya me
Dara jînê tucarî nabişkive bi ava
Lê ber digrî bi xwîna dil û cerg û hinava
Hezar rehmet li we be pakrewanên helebça
Li zarokên bê guneh li kal û pîr û keça
Wekî Tîrêj dibêje : Hûn bûn goriya welat
Ew xwîna pak û paqij we da mizgîn û xelat .

Tevrabûna felestîn

Selahedîn serî rake ji gorê
Ji mizgefta Emewya xweş binêre
Li çar goşê Felestîn bûye halan
Li dengê navtêdanê guh bidêre
Millet bi ço û kevra tête dijmin
Gişa sîng dane ber gula ji pêre
Ji Colan û Xeza heta bi Yafa
Li qadê xwîn dirêje şer bi gêre
Kurên Sehyûn welat tev kirne wêran
Kirin kavil çi mizgeft û çi dêre
Binê destarê cengê hatye danîn
Li yek hawî ser û laşan dihêre
Keçan tev şîn girêdane seraser
Kezî kirine diyarî ,han jî vêre
Ewa Beytlqudis gazî dikî te
Xwe rapêçe ji bo mala xwedê re
Li şînbozê siwar be wek berê tu
Ku dengê te wekî qotîna şêre
Bi gurz û şûr û mertal dakevî şer
Tê meyadanê bihêlî ma ji kêre
Li meydana te dijmin qet xwe nagrî
Ji te tim dil bi tirse û newêr e
Esed rabe digel sîpah û leşker
Ji xakî Şam bi berbanga sibê re
Bi gernasî tu îro dest hilînî

Şeveq der tê di tarîka şevê re
Felestînê tu rêzgar ke ji dijmin
Bi destê xwe tu vê şermê veşêre
Bipêşkev ey tu serdar û tu pêşwa
Tucarî tu li qelsmêran menêre
Eve dunya hemî ked û xebat e
Cîhan warê piling û fîl û şêre
Giya ta ku bi xurtî hêz nedî xwe
Bi der nayê di bin hîmê çiyê re

Zevî b'cot û bi sê gîsna nebî şûv
Ku tov pê wernebî b'çax û demê re
Neyê avdan bi baran yan bi avê
Kurî nade di lat û sersedê re
Qezenc nadî tu tişt bê kar û tevger
Belê pêk tê bi xwêdana kedê re
Erê Husnî Mubarek dostê dijmin
Ala Sehyûn li Misrê fêrefêre
Bi kamdêvid vexweş hatye girêdan
Li Qudsê tu bi çavin pêl dinêre
Tu xweş bawer be ku xortê çemê Nîl
Nevyê kînane pir jîr û bi kêre
Belê çibkî mecal dijwar û tenge
Mixabin ew ji fedya ser li jêre
Ewê verşîne wan zincîr û qeydan
Bi sehwe wek pilingê ser zinêre
Wê rojek bê ku taca ser milê te
Bibî gog ew ji çogan û şegê re

Ala Sehyon ji ser banê serayê
Wê bê xwarê tevî xeml û sitêre
Ji bîr mek kuştina Sadatê bingor
Ku çerxa dem wekî gwîzan û kêre
Fehed şahê Hicaz dostê Emêrka
Emêrka dewlemend û xurt û têre
Tu betrola xwe dispêrê bi carek
Bi barê gemy û geştan zîv û zêre
Ewê nifta te tev wan zîv û zêra
Dikî çek û sîlah ,dişînî jêre
Ku Israîl ji we qewxê dixwaze
Bi zîv û zêr û malê we çi mêre
Huseyn nakî hedan ling nake bin xwe
tu dinyê tev didî , paşa te xêre?!
Bi firoka li çar goşê cîhanê
Diçî û tê li jor û geh li jêre
Bi lavlava Qudis qet nabe azad
Ku ne'b hêz û huner be şûr jî pêr e

Felestînê tu nastînî bi xelkê
Bese êdî ji vî hawî bigêre
Seddam rûnê bela bavêjne ser te
Keç û qîzik bibên (sedamî zêre)
Bi şeş derbê li dîwanê her û wer
Bi çavan tim di çar hawêr binêre
Bi temtêlê tu xweş box û berane
Li Bexdayê serok û sekretêre
Ji dijmin re dikî kar û xebatê

Xelîc tev da Emêrka şet jî vêre
Ku hespa xwe te da dijmin diyarî
Serî berde bi hefsar û gemêre
Bi zengo ew li qirpûzê siware
Bi qoş têyê ku meydan maye jêre
Iraq tevde bi dest dijmin ve berda
Çi mêrxas û 'egîd û şoreşgêre
Bi melhêbê peyakî pir lebake
Li xerbî bêndera dijmin didêre
Di laşê miletê xwed bûye mekrob
Kwînêrek ser nixûm û bin bi gêre
Ereb tevde dizanin ku ne doste
Geraşe arvanê dijmin dihêre
Divê hûn xwe nexapînin tucarî
Qudis nayê di vê şop û riyê re
Li benda kêne hûn îro bi carek
We ser daye ji tamara xewê re
Divê îro Felestînê nehêlin
Ji Şem'ûn û ji Ishaqê Şamêr re
Dikim gazî bela deng bê guhê we
Bi xwe Tîrêj peyake b'şoreşê re.

Newroz

Ey newroz newroz newroz newroza bav û kala
Tev xêr û bêr û pîroz roja cejn û sersala
Ku berya du hezar sal hem pênsed û not û neh
Ezdehak hate kuştin bi dest kawa û hevala
Bîst û yekê avdarê ew kêf û şademanî
Li bajar û li gunda li hundir û li mala
Wek îro hat guhartin tarîxa rojhilatê
Dewra sitemkara çû ket dest coykar û pala
Bû serdar û xwedî şan qata cotkar û karker
Ketî bin pê û linga taca şeh û qerala
Ev pêta agirê gûr nîşana serfirazî
Welat tev bû wek burkan tu der nemayî vala
Gel tên geşt û seyranê bi xemla kurdewearî
Xort tev bi şal û şapik lê keç bi rengê ala
Pîremêr tên seyranê bi kolosên xerzanî
Pîrêjin tev bi kofî qîz wek karên xeala
Keç û xort û pîr û kal girtine reqs û govend
Dengê saz û dîrokan giha ezmanê bala
Tim daxwaz û omîda Tîrêj eve şev û roj
Her gel bighê mafê xwe em jî wek wan hevala.

Gur û rovî

Dibê ji çayê şingal ji newala pîr kemal
Rojek bi berf û bahoz gurê şîn rê dikir toz
Berê xwe daye bakur geh li vir û geh li wir
Ku li deşta Barava ro li gur çûye ava
Gurê qenc û dilovan li cem rovî bû mêvan
Rovî bi dilkî şewat gelkî do wî wer dihat
Bîna gur hate ber wî kirin karê şîva wî
Çerm û pêlav û çekur rovî li ber kom dikir
Şîv xwar û dest hilçenî go: herhebe ez benî
Piştî bergeş hilanîn şevbuhêrka xwe danîn
Peyvek ji vir yek ji wir rovî pirsek jê dikir
Tu ji ku tê vê demê tê herî ku vê sermê
Gur bersiva wî dida şêr nexweşe li Serheda
Di nav ciyan dinale nexweşekî bê hale
Şah û xwinkarê meye ew taca serê meye
Ez îro bûme rêwî da ku serkî bidim wî
Rovî bi aqlê wî kenî jêre gote ez benî
Civata şêr xwemalin tev piling û şepalin
Hemî li dor civîne cê wek min û te nîne
Peyva mi têx serê xwe sibe veger mala xwe
Vegere tu j' vê xetê dîno gunhê mib te tê
Gur ev nekir serê xwe jê wergerand serê xwe
Wê şevê ma li wê derê serê sibê kete rê
Gurê şînî çîm teşî qunax bi qunax meşî
Rê hemî teht û kelem pey du roja giha cem
Bi tore û bi fihêt patek ji şêr re avêt

Go : ey şahê b' text û pa serekê hov û teba
Rovyê genî gotin çot wisa wisa wisa got
Şêr gelekî azirî çar hawirî xwe nerî
Gote piling û şepal vî sehî bînin ji mal
Bê tore ye ev sêwî da edebkê bidim wî
Bi emr û fermana şêr herdû daketin ber jêr
Rovî bi qeyd û zincîr anîne dîwana mîr
Go: şêrê dev bi xwînim çavê te zû derînim
Tu nahêlî ey dijmin kes serekî bidî min
Rovî got: ey qehreman gorî te be dil û can
Guh bidêre li kola meka bawer ji tola
Pir gotin û kurpist dused virin yek durust
Ger du rû bim weke gur xwedê min bike gawir
Ne wek gur ez bê kêrim çav pêl û ser li jêrim
Go: ey şahê dem û wext xwe dirêjke li ser text
Text ji darê dar guhîj şêr xwe li ser dikir pîj
Ji simûçkê lingê wî heya binê çengê wî
Parsû û herdû tenişt kulîmek û zik û pişt
Bi dest û guh bi dorbîn tu der nehişt bê nerîn
Xwe da bû ser milê wî guh danî ser dilê wî
Rabû li şêr dimeyzand vêra serê xwe hejand
Go: textorê Luqmanim Eflatûnê zemanim
Bi zanîna xwey dirust min di êşa te derxist
Metirse ey begê me lepta dilê te kêm e
Ji mir bînin kabê gur da ez bisom ji agir
Di hawinê binî kûr bikim weke kilê hûr
Tu vê serm û bahozê hilkişînî vê tozê
Tu deh rojan bik deyax tû dê bibî sipî sax

Rovî da xwe hêz dida go: b'xatirê we tev da
Se'et li min wek salin çêlîk birçî li malin
Dilê gur girt û berda şêr awirek tê veda
Çav kir piling û şepal nig lê kirin wek xirxal
Pêsîr tev lê dibû xwîn kab ji çogê deranîn
Çeqel kete ber çenga di kulkulî b' sê linga
Birîndarekî birçî rê dûr û bê war û cî
Li newala geh li sirt di ber rovî re bihurt
Rovî go: tu ji ber jor j' ku tê xwedyê şimka sor
Yê bikolî kortala ji bo yar û hevala
Çiqa ji xwe behwer bî wê ew bi xwe tê werbî
Rasto bi rastiyê re xwaro bi şkestiyê re
Peyvên pêşiya wek dur binê çi hat serê gur
Tîrêj bi agedarî ev helbest kir diyarî .

Birrê Şînê

Şîna Ehmedê Menco

Felek bê soz û bê wicdan û dîne
Ku ew herdem digel me kerb û kîne
Neyar û dijmin û bêbexte zikreş
Tucarî qet nedî me j dest , demek xweş
Li pey me tim bi qût û qîr û halan
Bi zindan geh bi kuştin geh bi talan
Çi heqê te'l meye qet ez nizanim
Çiqa bê merwet û bêbexte zalim
Çi xortên zane û hêja dibînî
Ji me kurdan çi zû wîd radqetînî
Bi ber gorêv dişînî ew riya dûr
Veger nîne ji wê tirba reş û kûr
Erê Ehmed kurê Menco birader
Ne bes bûn kul te jî derdê xwe da ser
Gelek heyf û hezar carî mixabin
Kesê wek te ji nav kurda beta bin
Kesê wek te welat gelkî bi hacet
Ji ber ava ferat heta çemê şet
Serî rake ji tabûtê hevalo
Li çar hawêr binêre ey şepalo
Li dor gora te tev yar û hevalin
Hemî pismam û ap û dost û xalin
Ji ber ku pir delalî ey tu Ehmed
Te deng dabû ji vir heta bi Amed
Birû qeytan enî wek ya berana

Tu serdarê hemî xort û ciwana
Gelek qenc û çiqa comerd û camêr
Ji pola zend û dest mîna lepê şêr
Bi temtêlê wekî bejna siyamend
Li Sîpanê Xelatê şêrê serhed
Çiqa pesnê te bêjim ey birader
Xelas nabe bi sed xame û defter
Bi sûnd û soz û peyman bî li ser me
Bi wî navê teyî hêja digel me
Dema kurd serfiraz bin ey dil û can
Emê tev bêne dor te b def û dîlan
Li dora te b gerînin reqs û govend
Gelek xort û keç û qîz û şekerxwend
Ku xort tebl û sazan bi mil din
Ala rengîn li ser gora te hildin
Ji bîr nakin tucarî çarşema reş
Ji mahê der sibat jê bîst û hem şeş
Hezar û nehsed û heftê û sisyan
Eve tarîx ji bo mirna te nîşan
Heta vêder bi kêmanî me ev got
Bese Tîrêj te êdî ev ceger sot .

Şîna Mihemed Elîyê Şiwêş

Ey heval û hemdemê rahê welat Mehmed Elî
Sed hezar rehmet li wê gora te be j'ber vî dilî
Ma çi zû koça xwe barkir te ji nav êla xweser
Te berî daye riya dûr û dirêj û bê veger
Bi tenê îro te em hiştin li çol û kerbela
Ew buhar û war li me bûne cihê derd û kula
Ka dem û dewra berê ma kanîn ew kom û civat
Sed mixabin çûye gorê tu bi hesretiya welat
Partiya xweybûn dipirsî kanî ew xortê ciwan
Destbirayê Nûrî Zaza ew hevalê Qedrî-can
Bendê Ronahî û Roja nû û Hawar û Sitêr
Tev li te îro dipirsin kanî ew gernas û şêr
Rêberê xortên dilovan şeg û zana û şiyar
Tevger û kar û xebata te ji bîr nakin tucar
Mêjuwa kurd ez bihêvî me tu vêga guhbidêr
Rûpelên pêşîn tu binvîse bi ava zîv û zêr
Ew xebat û karê pê rabû bi zanîn û bi hiş
Da bixwînî miletê kurd dem bi dem û nifş bi nifş
Reng û nîşanên te sawêrin li nêk min her demê
Sed xebînet ku ketin bin axa sar û qeşemê
Ebrû mah rû afîtab ma ey tu gora serneşîv
Feleke îro di birca te'd civîn ew roj û hîv
Rûgeş û comerd û ciwamêr dilfireh û dev li ken
Dest vegirtî bar biwêr bû neqşê Manî lêv û çen
Ey birader mirina malikxerab bêbext û dîn

Dest li ber nayête hildan tê me ew her dem bi kîn
Xweş tu bawer be bira her kes li ber roja xwe ye
ku çiqasî em bijîn dawî mirin para me ye
Li te mizgîn be rûwa me va ji hêla reş hilat
Şewq û pertava xwe da Zaxros û Şingal û Xelat
Bayê kurd rabûye va dolab û çerxa me gerî
Serfiraziyê dixwazî wê bijî qet namirî
Vane pêşmergên dilêr dest birne ser gurz û çeka
Bejin û bala xwe girêdane bi rext û fîşeka
Wan bi navê şoreşê îro teva sûnd xwarine
Ketne ber pêxa neyaran gir bi dijmin girtine
Wa ji Amed te Hekarê ta Mehabad û Metîn
Ceng û halane li çar goşê welat tev bûye xwîn
Sitem û xeşma neyaran ji welat tev dê biçî
Doz û armanca dilê te ne dereng wê bête cî
ku digel baqên gulan gora em tev bêne ser
Dê li ber kêla te hildin ala kesk û sor û zer
Ta ku ew gora teyî pak lê bibî mêrg û buhar
bilbilê şadî li ser herdem bikî qîr û hewar
ez çiqa bêjim bira nabin xelas ev guft û go
Tu li min megre li ser te ger bi kêmasî mi go
Bîst û çarê çirîya pêşîn ji bîr nakin bira
Hezar û nehsed û heştê û pênc vemirtî ew çira
Sed hezar rehmet ji cem Tîrêjê dil tev derd û êş
Her li gora te bibare Mihemed Elyê şiwêş .

Şîna Idrîsê Barzanî

Bira Idrîs ne wext bû ma çi zû vêga te barkir
Dilê pîs û neyar û dijminên kurda te şa kir
Bi pê çavê serok şahî li me tev lerz û ta bûn
Qelawizê xem û derdan li me dîsa xuya bûn
Tu bawer be keç û xort û pîr û kal mest û gêjin
Li ser te ew dilop û hêstirên xwînê dirêjim
Ne wek Sedam dibêje tu bi dest wan hate kuştin
Sedam Iraq xerakir wî du sed xort tê nehiştin
ji sîka xwe ditirse herdem û roj û êvara
Bexda û Faw û Besra çûn li ber topê neyara
Gelo raste qeder herdem digel me ew bi kîne
Bi kuştin geh bi talan û timî şopa me xwîne
Di vê dewra cîhanê bo gelan mizgînê xweş tên
Xelata me bi dest çerxa felek kuncîlê reş tên
Bizane ey felek kurd tev de şêrin dev bi xwînin
Ji dijmin re tucarî ew serê xwe natewînin
Fidakarin li hevrazê çiyane ew şev û roj
Li xwînrêj û setemkara timî jînê dikin doj
Ji tarîxê pipirse kurd xwedawend û keya bûn
Mîtan û Mîd û Merwanî xwedî tac û sera bûn
Serekdar bûne guhderz , Restem û Xesro , Firîdon
Salyan distandin wa'j Eskender û Aşûr û Sercon
Bi xwe dîsa ewin îro ne kêmin û ne yaxin
Xwedî tarîx û torin kok û qurmin ew neşaxin
Tucarî ew li ser mafê xwe nadin jînperstin

Di meydana şer û cengê de qet nayên şiketin
Azadî ne bi lava ye bi dev berno û şûre
Millet tevde li kare lê belê warê me dûre
Şop û rêça Berzanî daye ber me dê biserdin
Bi comerdî emê xwînê birêjin ser biderdin
Wê rojek bê çi dûr nêzîk emê bighêjne wara
Emê bên der ji bindestê setemkar û neyara
Hezar û nehsed û heştê û heft ,yekê sibatê
Birayê me bi êşa dil mixabin çû wefatê
şev û rojan timî Tîrêj bi lav û bendeware
Kaka Idrîs heazr rehmet li gora te bibare .

Şîna Seydayê Cegerxwîn

Li ser gora Seydayê Cegerxwîn qubek hatiye ava kirin di rengê geşteyekê de û Seyda gora Cegerxwîn kirye mîna çiyayê Cûdî û ew geşte kirye wek geşteya Nûh û Seyda weha gotiye :

Ev cûdiye ez îro bi çavê xwe dibînim
geşteya Nûh ku li rajore bi bawer û yeqînê
Birca Babile eywanî Kesraye dibînim
Tev neqş û negarên dur û elmasin ji çînê
Yan qesrek ji kevrê mermere ku ez dibînim
Seyda têde razaye li ser textê evînê
Va xort û keç û kal têne meydanê bi mizgîn
Da pîroz bikin îro li te vê şehneşînê
Çavnêrê te ne vêga dixwazin te bibînin
Em tevde bi hêvîne ji Seyda yek civînê
Wer carek bi derkev tu ji wê birc û serayê
Da em ku mijûl bin tev bi wê dîdar û dînê
Tu 'b zarê xwe cewher ji dev û lêvan birêje
Da em têr bibin îro bi wê peyv û nerînê
Tu'j mêjve di xewdaye êdî bes rabe ser xwe
bêtir ji du salan tu di orta wê nivînê
Ser daye xewa şêrîn tu bê xem û xeyale
Ro hatiye nîvro ma gelo nadî te tînê
Ma qey tu Memê ye ku di zindanê dinalî
Sed heyf û mixabin têr nebû b'dîtna Zînê

yan Ferhade îro ketî ber pêlên di avê
Şêrînê vexwar ew jehra perwîza negînê
Ya rengê Siyamed ku li Sîpanê Xelatê
di gelî de kûr dinalî ku Xecê l'ser dikî şînê
ser hilde ji xwe'r carek li dunyayê binêre
îro tu temaşeke li vê dewra zemînê
mizgîn li te va xortên me mil dane hevûdû
wek şêra ji Bîngol ta bi Zaxros û Metînê
Himîna kurê bava li ser şax û zinara
dijmin dane ber hev koh û deşt sor bûn ji xwînê
Gurîna firoka ye li ezmanê me kurda
Dengê tang û topaye li erda bi qupînê
Dîna xwe bidê Seyda welat tev bûye burkan
Şev bûne wekî roj tev ji agir û rivînê
Sûnda me bi gurzê Rustem û çakûçê Kawa
Textê dewleta Mîdya û şahê fareqînê
Sûnda bi Mehabad kaniya xwîna şehîda
Ala destê Barzanî li ser çayê sefînê
Sûnda me bi kêlê ber serê wan pakrewanan
Sûnda bi ruhê Leyla bi wê xwîn û birînê
Ev çerx û dem û dewran hezar salî neyar bin
Em ser natewînin qet bi vê kerb û bi kînê
Navêjin ji dest xwe em tucar darê tifinga
Qefdên xincera îro di kozik û kemînê
Kurdistan biparêzin ji dijmin û neyaran
nadin ji welat yek bihust û gav û erînê
wek Tîrêj dibêje bese ev bindest û jarî
bê şewket û ala ma emê çibkin bi jînê .

Şîna Suxtên Zêwa

Li Zêwa dibû wekî şeva reş
bi destê Sedam rijêma xwînxwar
Ji balafirên semtî û mîrac
bumbe wek birûsk ji jor têne xwar
Ew toprax hemî bû pêt û dûman
Mij û mûranê girtiye ezman
Qîr û qiyamet fîxan û nalîn
Sed û bîst kuştî gelek birîndar
Werin binêrin li term û laşan
Li wan cendekan li wan telaşan
Gewdên bê serî li nava êlê
Li ber her derî qîrîn û hawar
çi gunhê wan bû ew kal û ew pîr
Çi gunhê wa bû zarokên bi şîr
Ma gelo eve şeref û namûs
Sedamê faşist conta gunehbar
Çi lîska te kir qet ne çû serî
Çawa tu davê li te vedgerî
Ew fitil û pêş û ew pehlewanî
Li te çûn gilî pîçê setemakr
Iraq te tev kir zîvar û terîş
ji bo gelê kurd tev te da bexşîş
Şetel Ereb û sê perçê Xelîc
Te tev dan şahê Ecem yadîgar
Bazinê destê ciwan û bûka
heya bi zêrê serê biçûka

Nifta Kerkûk û Hiwêz û Besra
Te tev li ser kir gornepaşê har
Xortên gerdengaz wekî dibînî
Tev bûn êzingê agrê Xumeynî
Badî hewa çûn te pêk neda pêş
Bi hezar gavî tu maye ji par
Keç û zarokên gund û bajara
sêwî te hiştin li ber dîwara
Bûkên di salê tev mane jin bî
Bê bira hiştin qîzên berxwedar
Ka mêranya te heyf û mixabin
Xumeynî li ser , tu ma ferê bin
Rişma te îro ket destê Hisên
Sergoşake teng bi gem û hefsar
ka ew fortên te ew cengebazî
Li hevhatinê îro dixwazî
Dilê xwe xweş mek xumeynî nake
Heya tu 'l Iraq bimînî serdar
Tu û şela xwe heya neyên der
Aştî nakeve Iraqê yek ser
Welat bispêre peyên dîmoqrat
Iraq dibî yek nabî pişk û par
Dana te da şah te xist vê wertê
Lê dikî nakî nema jê der tê
fitil û bermê te badîhewa çûn
Ey rovyê çepel peyê koledar
Kuştyê li Zêwa suxtên Qel'ediz
Ew pakrewanên şehrê Rewandiz

Te tev de sotin bi agirê sor
Bê şerm û fedî ey kolê neyar
Canê wan tev bûn wek mûmê şewat
Şewqa xwe vedan ser xakî welat
Xwîna wan rijî bin dara jînê
Bi wê xwîna pak bişkivî ew dar
Bi sozemana adarê nakî
Ta ku mafê kurd tu pê winda kî
Xincera Serok Berzanyê nemir
Dîsa di pişta te de diçî xwar
Pêşmergên dilêr dîsa wek berê
Şerê te dikin li her deverê
Rizgare îro sê parçê welat
Bizan gelê kurd namirî tucar
Hezar û neh sed heştê û pênca
Nehê Hizêranê kuştina gênca
Tîrêj menale tarîxa Zêwa
Ketî defterê rojek bi hejmar .

Şîna Qenatê kurdo

Hevalê Qenat hevalê Qenat
Çi rojek ne xweş bi ser me de hat
Mirna te îro ziyan da welat
Ji roj bi ava heya roj hilat

Bi vê çûna te hevalê Dilêr
Ji dilê min î hejar û bêkêr
Dilopeke xwîn midî hate xwar
Xwe berdaye ser rîşa minî zêr

Ez tev lerizîm dest bûne rêsî
Tilî ji hev çûn xame teyisî
Bi wê dilopa xwîna dilê xwe
Ji kul û derda mi ev nivîsî

Çiriya paşîn reş meha wek şeb
Te'j me raqetand bê sûc û sebeb
Qenatê Kurdo rêzanê mezin
Rêberê ziman Seydayê Edeb

Çi zû te bar kir ji nêv me yara
Te em tev hiştin li şûna wara
Çûna te vêga ne pir bi wext bû
Yên wek te nayê her çax û cara

Qenatê kurdo heyf û mixabin

Yên wek te îro miryê gora bin
Heval û hogir Şînê bikêşin
Neyar û dijmin bi kêf û şabin

Hevalê delal derdê me kûre
Şi'ra mi gotî pir kêm û hûre
Kerwan bi rê ket xewa te zû hat
Qenato rakev rêka me dûre

Gelek wekî te çûn dil bi hisret
Mîna Kamîran wekî Celadet
Kanî Şêx Se'îd Ihsan û Qadî
Kanî Berzanî şêrê bi heybet

Dema tu bighê nêv wan şehîda
Silavan bikî li wan Egîda
Bihejîn Dest seyda Cegerxwîn
Wekî newroz û sersal û îda

Mizgînê bid wan kurd nema dimrî
Çi jê bê kuştin çiqa jê herî
Xwînê dirjînî bi serbilindî
Ew ji doza xwe nema vedgerî

Tîrêj de bigrî li ser hozana
Li şoreşgêran li torevana
kerwanê jînê ji te bi dûr ket
Tu bû nêzîkî civata wana .

Şîna Silêman

Kawa serê xwe rake meyzeke tu 'l vê dozê
Lawê te xwîn rijandin ji bo cejna Newrozê
Tu xweş zanî gelê Kurd hemû gernas û merdin
Ji xwînê re çiqasî çav fireh û comerdin
Silêman ey kurê genc serbilindê navê xwe
Tu bû malxuwêyê malê ji bo kalê bavê xwe
Lê te qîma xwe nanî bi tembelya civatê
Te zend û bend vemaltin ji bo kar û xebatê
Bi pêlava lastîkî bi çakêtkî ji balê
Bi bentelonkî xilmet tu bû karkerê malê
Tu ket warê xebatê şêr û gernasê welat
Cilka jar û xizanyê te zû ji ser xwe avêt
Lê namûsa pir mezin ku hate roja welat
Ruh û canê xwey şêrîn te da mizgîn û xelat
Tu îro dewlemendî bi şerefa navê xwe
Te îro pir hildaye serê kalê bavê xwe
Şerefeke pir giran te daye xuşk û bira
Te li gundê Lodika vêxistî mûm û çira
Tu îro bû şehîdê bîst û yekê Adarê
Navê te hate kolan li ser enya buharê
Tu jî îro gihiştî wan şehêdên li Zêwa
Tu bû ji wê civatê tu ket sef û rêza wa
Silêmanê qehreman bi jîna xwey ciwanî

Îro berî her kesî xerc û bêşa xwe danî
Silêmanê dilawer me'd nav xwîna te de dî
ayineya Berzanî resmê Se'îd û Qadî
Ew xwîna pak û paqij ku li qadê bela bû
Çiya û deşt û zozan hemû têde xuya bû
Bi sûnd û soz û peyman tucar em xwe nadin paş
Ji ser rê û şopa te can dê bidin bi şabaş
Bilîlîn ey keça Kurd bes bigrî tu'b delalî
Li ser xortê nûhatî ciwanê çarde salî
Baqên gula bibarîn li ser gora Silêman
Xortê çeleng û hêja canfidayê Kurdistan
Gelo şens û bextê me ta kengî wê li xwar bî
Ev feleka malxerab digel me tim neyar bî
Çiqa pesnê te bêjim xelas nakim tucarî
Hezar rehmet ji nik min li gora te bibarî
Sala hezar û nehsed digel Heştê û şeşan
Bîst û yekê Adarê şehîd çûye Silêman
Tîrêj bi fexr û nazî dike şîna te herdem
Kurê mihemedê Emîn , heval û yar û hemdem .

Şîna Mihemed Şêxo

Sed hezar ax û keser îro ji kovanên di kul
Her bi fîxan û bi qêrîn û hewar bavê felek
Ez li ser canê teyî şêrîn dikêşim dem bi dem
Hêsirê xwînê ji çavan têne xwar Bavê Felek
Leşkerê derd û xema îro bi êrîş têne dil
Qehremanê Çerxê gerdûn payedar Bavê Felek
Zû ji nav êlê te bar kir ey hunermendê mezin
Reqs û govend û sema tev mane sar Bavê Felek
Konekî reş hat vegirtin ew li şûn warê teye
Têne govenda te îro bê jimar Bavê Felek
Deng û pêjin qet nema tên kanîn ew reng û nîşan
Sed mixabin ku ketin bin xakî sar Bavê Felek
Maye sawêrek li ber çavê me ew xortê ciwan
Ew dev û lêvên li ken ew peyv û zar Bavê Felek
Kanî ew dengê teyê zîz wek sura bayê siba
Dengê qêrîna qulingê ser zinar Bavê Felek
Şalûrê deşta Silîva bilbilê baxê Xelat
Totiyê çayê Hekarê mûsîqar Bavê Felek
Şehrê Qamişlo ji mer bû wargehê saz û Edeb
Mexelê Seyda û sazbendê komar Bavê Felek
Mehmedê Şêxo bi hêvîme ji wê bejna zirav
Bik silavan li Cegerxwîn û Hejar Bavê Felek
Bihejî destê ewan box û beran û kuştiyan
Ji bedêla me mirovên dil fekar Bavê Felek

Xweş tu bawer be di can û dil me de her tê bijî
Qet ji nakin xebata te tucar Bavê Felek
Rehmeta Yezdan ji dev Tîrêj li ser gora te be
Gor bibî mêrg û gulîstan û buhar Bavê Felek .

Hûrbînî:M bavê Nisrîn
I bavê Şêrîn

www.tirej.info

Friday, February 23, 2007